

Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî (6)

# **Pirsiyarîya Kurd**

## **Mêjûwa Kurdan û Niha Wan**

**Dr. Bilêc Şêrkoh**

**Werger Dr. M. S. Cuma**



Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî (6)

# Pirsiyarîya Kurd

Mêjûwa Kurdan û Niha Wan

(Civata Xweyîbûnî Kurdîyî Welatperwer)  
- Belavoka Pêncem -

Dr. Bilêc Şêrkoh

Werger Dr. M. S. Cuma

**Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999**

# Navrok

Pêşgotin.....	4
Pêşekî.....	8
Mêjûwa Kurdistan, Koka Kurd û Mêjûwa Wan.....	11
Ciyografiya Kurdistanê .....	19
Kurd û karên wan ji bona Bajartîya Misulmantîyê û Zanyarîya Erebi.....	36
Hinek ji Peyvên Mêjûvan û Lêgervanên Firengî li ser Kurd de.....	40
Destpêkirina Pevçûnê di Navbera Kurd û Turkan de.....	45
Mêjûwa Şûreşên Kurd û Pêşveketinên wan.....	52
Kar û Barên Zanistî û Xebata Siyasî.....	67

### 3 Pirsiyarîya Kurd

---

Kurd Piştî Destûra Osmanî.....	71
Di Pêla Cenga Giştî de .....	78
Piştî Şer Rawestandina Giştî .....	84
Peymana Sêver .....	91
Beşê Sêyem: Kurdistan.....	91
Sûreşa Welatîyî Mezin der sala 1925 de .....	101
Barkirinên bi darê zorê ve û serbirîn .....	112
Civata "Xweyîbûnî" Kurd .....	118
Rewşa Niha.....	123
Hovîti û Serbirînen nuh.....	126
Gotineke Tevayî .....	132
Ji Bona Netewê Erebiyî Comerd.....	138
Xuyanîyek li ser Serbirîn û Hovîtiyên, yên ku ew berê hatine binavkirin, em didin bipêşkeşkirin: .....	142

## Pêşgotin

Xwendevanên hêja!

Vaye ez ji bona nav detsên we vê Nameya Xweyîbûn: Pirsîyarîya Kurd, Mêjûwa Kurdistan û Niha wan bi zimanê Kurdî zaravayê kurmançî ve didim bidanîn. Werger pir wirya ye, ku belê dê pir kêmanî jî di vê wergerandina Kurdî de ji Erebi bête bidîtin; jiber pir nav bi Erebi ve hatine binivîsandin. Min li gora zanebûna xwe de ew bi kurmançî ve datin binivîsandin. Ez ji niha de hêvîya lêbûhurandinê ji Xwendevan û Rexnevanan didim bikirin. Ez pir hêvîdarim, ku çapkirinên dinî tên, yanjî wergerandinên dinî tên dê deha bi baştir û rêk û pêktir ve bêtin biderkevtin.

Xwendevanên giramî!

Ev nameya hanê di sala 1930 de bigir berî şêst salî bi zimanê Erebi û Firensî ve hatîye binivîsandin. Gava Merov wê niha ji xwe re dide bixwendin, tê bêje, ku belê îro yanjî donê ev nameya hanê hatîye binivîsandin. Wê ne nêrxê xwe û ne jî wê nuhbûna xwe jî ji nava destên xwe

bigir di her warekî de nedaye biberdan. Ew bi renegekî zanistîyî pirî bilind ve bi kurtî, bi lihevhatî, bi givaştî û hêjbêtir bi gihastî ve hatiye binivîsandin. Ew bi xwe ve bi canê Insiklopêdiyeke Kurdîyî biçûk ve hatiye binivîsandin. Weha ji me re bîr û baweriyên vê nameya hanê pir bilind, dûr û kûr û hêjbêtir rast û dûrust têtin bidîtin. Ev rastîya hanê jî ji me re mezinbûna kanîya zanebûna Nivîsvan, gewrebûna serpêhatiya wîna û qûlbûna têgihîştina wîna di mêjûwa Mirovanyê de bi giştî ve û di mêjûwa Kurd de bi taybetî ve bi diyarî ve dide biderxistin. heger em hûr û kûr di nava dêr û rêzên vê nameya hanê de li ser ronahîya van şêst salên çûyî de ji nûve rûdanên vê pêlê di xebata mêjûwa kurdistanê de li wan de bidin bitemaşekirin, dê emê careke din dûrbîn û pêşbînîya vî Nivîsvanê Hozan bidin bidîtin.

Di nava van pêlên şêst salî de guhertinên mezin li seranserî cîhanê de û herwehaji di xebata Netewê Kurd de jî hatin bidîtin, lêbelêji tevliwêji lênerinên vê nameya hanê jî di armanca xebata Kurd de mûyekî kêra wan jî ew hêjî ne hatine biguhertin: 1. Serxwebûna Kurdistan û Pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe. Jiyan bi xwe ve vê bi xwe ve her û her bi neçarî ve li ser kurdan de dide bineçarkirin. Hêjbêtir tevaya serpêhatî û mêjûwa xebata me di vî şêst salên çûyî de bi darê zorê ve li ser me dide bineçarkirin, ku 2. Bingehê serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna Dewleteke Kurdîyî serbixwe divê ji Kurdistana Turkî bête bidestpêkirin. Ev herdu remanên bingehîyî pir bi nerx û hêjbêtir rast û durûst ve bi carekê ve bi diyarî ve di nava dêr û rêzên remanên vê nameya hanê de ji berî şêst salî ve hatine bieşkerekirin.

Serxwebûna Kurdistan û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe ev mafeyekî serûştîyî Netewê Kurd bi xwe ve



tête biderkevtin. Ev mafeyê hanê nayête bidan, lêbelê bi darê zorê ve ew tête bisitandin. Vaye em dibînin, bê ka çawa Netewê kurdî Perçekirî ew ji bona vî mafeyê xweyî Perest xebat û têkoşînê dide bikirin.

Her û her ew hêjî dara azadîya xwe bi xwîna pakî Keç û Lawên xwe ve dide biavdan. Herwehaji em dibînin, bê ka çawa Faşîya Borcuwazîya Toranî, Farisî û Erebi jî Dewlemendiya welatê me dide bitalankirin û bi serdejî ve bi hemû çekên dujehîjî ve Miletê Kurd dide biqirkirin. Weha faşîya Erebi vaye jêre nema çekên wêrankirinêyî berê ji bona talankirina Kurdistanê me û kole û bendekirina Miletê me didin bitêrkirin: jiber vêjî vaye Sêwîyên Eflêq, Qertelên Bexdadê kurdistanê meyî şêrîn û ciwan bi bombên kîmyawî û biyolocî ve didin bibarandin, da ku ew tevaya Jîndariyê li ser xakê me de bidin biqirkirin. Ev çepel, gurî û kotiyên mêjûwê pir nezandin, ew bi vî karê hanê ve bêtir û bêtir goristana xwe di nava Kurdistanê de didin bikûrkirin û pengizandina xwe ji nava xakê me didin bilezkerin û bi serxwebûna Kurdistanê ve ji bona tevaya dunyayê re didin bimujdekirin.

Jibervêjî xebata Kurdistanê ji bona serxwebûnê û Pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe bêhnekê jî nayête birawestandin, na hêjîbêtir ev xebata perest şev û roj jî vaye ew li her çar perçên Kurdistanê jî de tête bigûrkirin. Heger bi avê jî ma be, dê Pîrek û Zarokên Helebçe talankirina kurdistanê me bi carekê ve û tola xwe ji Qertelên Faşîyên Bexdadê bidin bisitandin. xebata Miletê Kurd bi saya xebata cemawerên wî ve bi darê zorê ve û bi hinera pêşveçûna qanûnên jînê ve bi serxwebûnê û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe dê bête bitac û bixelatkerin.

Ez hêvîdarim, ku Zanevanên Kurd dê bêtir û bêtir li remanên vê nameya hanê de bi wirdî, hûrbûn û dûrbîn ve li wan bidin de lê bidin bivenerandin û biliberkevtin, da ku ew ji serpêhatiyên mêjûwa me sûd û kelk ji xwe re bidin biwergirtin, ji bona ku ew gorîyên gihandina armanca meyî perest di serxwebûn û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe de bidin bikêmkirin û dema gihandina wêna bidin bikurtkirin. Herwehaji ez hêvîdarim, ku Zanevanên Kurd dê bêtir û bêtir li ser mêjûya Xweyîbûnê bêtin birawestandin û wê ji bona Xelkên kurdistanê bidin bidiyarkirin, da ku em bêtir li ser mêjûwa xebata xwe bêtin biagehdarkirin û serpêhatiyên pir bi nex ve jê ji xwe re bibidin biwergirtin.

Li vêderê jî de ez dixwazim bidim bidiyarkirin, ku di nava gundê meyî Kêstekîyî li paşvemayî jî de di temara tariya derbekîya rojhilat de min çavên xwe li ser bîr û bawerîyên Xweyîbûnê de û li ser destên Peyên Xweyîbûnê de date bivekirin û li ser destên wan jî de di zarotîya xwe jî de ez hatim bifêrkirin û biperwerdekirin. Ev jî bi saya Seydayê Abdul-Qedus û Birayê wî Mele Mohe-medê Cimîlê Seyda ve hate bikirin. Jiber vê jî ez wergerdina vê nameya hanêyî Kurdî jî ji bona wan Herdu Mirovan didim bipêşkeşkirin.

Berlin di 18. gulana sala 1989 de

Dr. M. S. Cuma

## Pêşekî

Di nava van çend salên dawî de bi vêketina şûreşên Kurdiyê li dûhev de û bi vegerandina rûdanên wan jî ve awîra cîhanê wan bi ser xwe ve dane bikişandin, sitûnên rojnaman dane bidagirtin û pirsiyarîya Kurdî di nava jimara giringtirîn pirsiyarên welatîyê giştî de dane bixistin. Lêbelêjî tevlivêjî hemû ragiyandinên li ser van şûreşên hanê jî de bes û bi tenha ve xwe bi nûçeyên kanîyên Turkî ve didan bigirêdan. Weha bi vî rengî ve rastî hate bipoşandin û derew û buxtan li ser van şûreşên welatîyê xurû de û li ser pirsiyarîya mirovanîyê bitirs de hatin bibelavkirin.

Weha welatperwerên Kurdên Xebatvan didin bibawerîkirin, yên ku wan şerê Turkan didan bikirin û hêj ew jî ji bona liberxwedana hebûna xweyî Milî û Olperestîyên xwe şerê wan didin bikirin, ku liberxwedan ji bona mafeyên wanî perestî nikare bête bikirin, heger ku ew li ser hinera çekan de neyête biavakirin; jiber ku bes û bi tenha ve Dujminên wan bi vêya ve bi tenê ve didin bibawerîkirin.

Wisa jiber peydabûna gumanê di nava hinavên

Welatperwerên Kurdan de bi karina rabûna Netewên rojhilatî, yên ku piraniya wan jî ji nava destên zalbûna Dewletên Impiryalî nalînê didin bikirin, bi alîkarîkirina mirovanîyê ve ji bona Miletê Kurdîyî sitemkêş, jiber ku Netewên Rorjhilatî weha ji hev hatine biçirandin û ew di bin tengavîyên diravî û siyasî de têtin bijîyandin, yên ku koka wan ji harbûna Dewletên Ewropî ji bona bi cihanîna dilbijandinên xweyî nehişî ve di wan de û herwehaji ji şopên serpereştiya Turkîyî sitemkarî wêrankirî têtin bidîtin, ya ku wê li dû xwe de ji destanan, ji belan û ji wêrankirinan li ser avanîyê û xweşiyê de date bihiştin, welatperwerên Kurd bi neçarî ve berê xwe ji bona xebata metiryalî ve dane bidan û wan bes û bi tenha ve berê xebata xwe ber bi hêza çekdarî ve datin bivekirin, da ku ew mafeyên xweyî talankirî bidin bivegerandin û azadiya xweyî xuwarî bidin bisitandin.

Weha gava Civata "Xweyibûnî" Kurdî date bidîtin, bê ka kanîyên Turkî çî ji derew û buxtanan didin bibelavkirin û wehaji ligel jî de bê ka xameyên bi kirê girtiyên Turkî ve çî jehrê didin birijandin. Weha wan bi vî rengî ve sipehîbûna van şûreşên welatîyî Perestî dane bigemarkirin, yên ku ji bona wan xwîn hate birijandin û can ji bona hêjatrîn armanc hatin bigorîkirin. Vê şeweyê ragiyandina hanê di nava pir civat û Desteyên Cîhanê de di nava dûrtirîn û nêzîktirîn Miletan de kêra wê cihê xwe date bidîtin. Herwehaji pêrejî wê cihê xwe li nik Netewê Erebyî merd jî de date bidîtin, yê ku wî li ser destên serpereştiya Turkî de rengên pir cuda ji zordariyê û sitembarîyê daye bixwarin. Wisa vê ragiyandina Turkîyî hanê di nava hin ji wan Miletan de date bikêrkirin, ku wê cihê rastîyê bi cihê derewê ve date biveguhertin.

Wetov bi vî rengî ve Civata Xweyîbûn xwe bi neçarî ve date bidîtin, ku ew Belavokekê bide bibelavkirin, da ku ew têde Netewan û nemaze Netewê Erebi li ser Kurd û Kurdistanê bide binaskirin û rastîya şûreşan bide bidiyarkirin, yê ku ew di nava pêlekê û ya din de li ser xakê Kurdistanê de têtin bidadan û herwehaji pêrejî da ku ew cewhera pirsiyariya Kurdî û qonaxên wêyi tanî niha jî bide biderxistin.

## Mêjûwa Kurdistan, Koka Kurd û Mêjûwa Wan

Agehdarîyên mêjûyî, yên ku ew ji bal Mêjûvanê Yunanî Xenophon -Zinefon- de di Nivîsta wî de li ser vekîşandina deh hezar Yunanî di sala 401 de di berî zayîne de hatine binivîsandin, ew didin bizanîn, ku Kurd ji Nevîyên Kurduene -Kurduîn- têtin biderkevtin. Ew bi pêşîya wan ve hatin bikevtin û wan beramberî Yunanîyan şerekî pir sext dane bilidarxistin. Ev peyvên hanê weha bi dirêjî ve tanî berî niv sedsalî zal hatibûn bimayîn, lêbelê Lêgerandinên Mêjûyî û Kolandinan di nava van salên dawî de peyvên din li ser Koka Kurdan datin biderxistin û wan datin bidiyarkirin, ku Kurd ji Yunanîyan bi demeke dirêjtir ve bi kevnartir ve têtin biderkevtin.

Weha di destpêkirina mêjûwê de li çiyayên pesarên Surî de Neteweyek bi navê Gutu -Gotî- dihatin bijîyandin. Gotî bi têgihîştina Şervan ve têtê biliberxistin, heger ku ew ji bona zimanê Aşûrî bi Gardou ve bête biwergerandin. Weha Sitrabo ev têgihîştina hanê ji bona diyarkirina navê Kardak di Neqşa xwe de date bikaranîn, ya ku wî ew di sala 60 de di berî zayîne de date bidanîn.

Weha Gotî xwedan alîyekî mezin bi şehristanîyê ve dihatin biderkevtin, jiber wan ji xwe re berekî pir fireh ji bona belavkirina bajartîya xwe di nava Netewên Hemsayên xwe de mîna Êlamîyan, Hititan û Babilîyan bi nivîsandina Mixî ve dane bipeydakirin.

Weha lêkolandinên zanistîyên Anthropologie -antropolocî- û Ethnologic -êtnolocî- bi diyariyên zanistîyên diyar didin biderxistin, ku kurd bi xwe ve ji Ariyan têtin bidakevtin û ew Ariyên hanê berî mêjûwê xwe bi van çiyayên hanê ve dane bigihandin û Xelkên cih yên berê ligel wan de bi kêra demê û bajartîya wan ve, ya ku wan date bipeydakirin, hatin bitevlihevkirin. Niha cudabûn di navbera Zanistvanan de li ser dema hatina wan Ariyan de ji bona vî welatî û ew ji ku hatine tête biditin. Nuhtirîn dîtin li ser van herdu pirsîyaran de dide bixuyanîkirin, ku ew ji bona vî welatî berî mêjûwê ji aliyê Iskendînavya hatine bibarkirin.

Wehaji gerji dema barkirina wan kengî be û cihê wê ji ji kude be, hîç guman bi renekî ve lê nayête bikirin, ku herdu rastîyên tên bi carekê ve ji bal Zanistvanên Karnas de di zanistîyên Antropolocî û Etnolocî de didin biderxistin: 1. Ku Kurd ji Netewên Arî têtin biderketin û ew ji Dundên wanî paqijin têtin biderkevtin. 2. Ku Kurd berî mêjûwê ji bona vî welatê hanê hatine bikoçkirin, yê ku ew niha li ser de têtin bijiyandin. Weha Kurd di dirêjîya dema Şahînsahîya Aşûrîyan de li ser serxwebûna xwe de date biparastin, lêbelê ew ligel Mêdyaya de hatin bilihevhatin, yên ku wan Ninewa datin bivegirtin û hîmên Şahînsahîya Aşûrîyî bi navkirî ve datin biherifandin. Weha ew di dawîya dawî de ji bona berdestê Kîroş hatin

### 13 Pirsiyariya Kurd

---

binaçarîkirin, yê ku wî Babil date bivekirin. Herwehaji wan ji bona Dundên vî Vekirvani Leşkerekî Kurdîyî bi rêk û pêk ve didan bipêşekirin.<sup>1</sup>

Weha Bavê mêjûwê Hêrodotê Yunanî, yê ku perçeyên pêkhatî jê Sipahê Xerces - Kîsra - dide binavkirin, Sipahê kurd bi van herdu navan ve Saspîriens û Alaradiens dide binavkirin, di wê hingava ku Mêjûvanên Îranî wan bi navê Kordha ve didin binavkirin.

Hiç Xwendevan lê nadin bigûmankirinn, ku Gotî ne bes tenê koka Kurdên jor û jorava bi xwe ve têtin biderkevtin, lêbelêjî ew bi koka Kurdên jêr û jêrhilat ve têtin biderkevtin. Jiber ku bajartîya li hêla Kermansah û Hemedan hatîye bipêkahtin, ew bi xwe jî ve bi nala rengê bajartîya Gotî ve tete biderketin, ya ku wî ew li bakur de li Kardokya de li Mêdya û herwehaji ya ku wî li Aşûr de bi xwe jî ve daye biafirandin. Ev jî jiber Eşîra Gulherî niha ew dide bibawerîkirin û herwehaji şopên li welatê wêyî derketî de didin biderxistin, ku ew ji reha Guherz têtin biderkevtin. Ev gotina hanê ji bona Serokekî Gotî tete bivergerandin, mîna ku Goran jî didin bibawerîkirin, ku ew ji Zaruwên Guherzên kiyû têtin biderkevtin, yê ku Lawekî wî bi navê Reham ve dihate binavkirin, ku ew ji bal Behmen Giyanî de ji bona wêrankirina Qodsê û dîlkirina Cuhana hate birêkirin. Reham di nava nivîstên

---

<sup>1</sup>Li Inskilopêdya Ingilîzî, li mêjûwa Mîrên Kurdan ji bal Danerê wê Şêx Sultan Memduh, li Inskilopêdya Elemanî û yan Fîrensîyî gewre, li nivîsta "Mêjuwa Neteweyekî Nenas" ji bal danerê wê Giyamîl sala 1900 û li nivîsta "Li ser Koka Kurdan" ya Mîrza Cozêf Çêrnîk der sala 1866 de bide temaşekirin.



Erebî de bi navê Bext Neser ve hate binavûbangkirin û di piştê ew ji bona ser textê Patîşahîyê hate bihilkişandin û Dûndên wî bi navên Patîşahên Goran hatin binavkirin û navên wan li ser hinek ji kevirên Biston de li Qesra Şêrîn de hatine bineqîşkirin. "Guhderz Kiyû" bi Merovekî rastî ve dihate biderkevtin.

Bi her awayekî jî ve Netewê Kurdî niha jî bi her çar Gelên xwe ve ji "Kurmanc, Goran, Lor û Gulher" ji kevinetirîn Netewên Arî têtin bijimartin, yê ku wan şahristaniyeke zor geş di Banîya Îranî û welatên dorhêla wê de datin bipêkanîn. Weha ew li ser tevaya Êlên Birayên xweyî Ariyî pêşî de hatin bizalbûn û zimanê wanî Kurdî bi zimanekî giştî ve hate bikirin, ku pê tevaya Êl û Netewan der Şahîşahiya dirêjkirî ji kanîyên Dicle û Firatê Tanî Dilava Farisî dihatin biaxivtin. Paytextê vê Şahîşahiya hanê "Akbetan" li hêla Kerminşahê de dihate bikevtinû ev zimanê hanê jî wê çaxê bi zimanê Pehlevî ve yanî bi Pehlewanan ve dihate binavkirin. Hiç gûman lê nayête bikirin, ku evaya ji gotina Gotî yanî Gardû bi liberketina Şervan yanî Pehlewan ve hatiye biwergerandin.

Herwehaji evaya jî piştê peyva Pehlewan beramber bi Kurd ve di Farisî de dide bigirtin, mîna ku ev peyva Kurd di nivîsta Şahname Ferdosî de dide biderxistin. Herwehaji hêjî di nava Êlên Kurd de di seranserî Kurdistanê de bawermendîyeke giştî tete bipeydakirin, ku peyva Kurd ji bona vî Miletê hanê hatîyê bidan, jiber ku ew di tevaya dewranên mêjûwê de bi mîrxasîyeke pir mezin û gernas ve her û her hatîye binaskirin.<sup>2</sup>

---

<sup>2</sup>Ji Pêşgotina Erebi ji nivîsta "Şeref Nama" farisî di mêjûwa Kurdistanê de, a ku ew li Qahirê di sala 1930 hatîye çapkirin.

Herwehajî delîlekî din jî dide bixuyanîkirin, ku Kurd ji Miletên Ariyî Kevnar tête bijimartin, jiber oldarîya wîyî welatîyî Mîrî li Kurdistanê de tanî belavbûna Musulmanîyê bi xwe ve ew bi "Oldarîya Zerdeştî" ve dihate biderkevtin, ya ku ew bes û bi tenha ve di nava Miletên Arî de dihate binaskirin. Ew bi xwe ve di nava tevaya Miletên Arî de bi oldarîyeke welatîyî giştî ve dihate biderkevtin. Tevî derbasbûna pir heyaman jî li ser windabûna vê oldarîya hanê jî de hêjî li hin hêlên Kurdistanê jî de bi sedan Xelk xwe pê ve didin bigirêdan.

Musulmanîî li Kurdistanê de li ser destên Xalid Ibin El-Welid û Xeyad Ibin Xenem de Hogirê bi nav û deng ve hate bibelavkirin. Em li vê derê jî de dixwazin bidin bibîrxistin, ku Kurd di pişte re jî li pênavê parastina serxwebûn û azadîya xwe de, ya ku ew bi zikmakî ve ji bona wan tête bievîndarîkirin, tanî pêla Xulefayên Abasîyan jî can û malên xwe didate bigorîkirin. Weha li bakurê Kurdistanê de ji bona serxwebûnê di nava salên 888 û 905 zayîné de şerên xwînavîyî pir sengîn hatin bikirin. Hiç gûman têde nayête bidîtin, ku dema zêrîniyî Kurd di sedsalên navî de bi xwe ve ew di dema Sultan Selah Edîné Eyûbî de dihate biderkevtin, yê ku wî Dewleta Kurdîyî Musulmanîî li piraniya hêlên rojhilata nêzîk de ji herem û şahsamanan date bidanîn, ya ku ew ji jêrî Qefqasya tanî Sena Yemenê li jor û jêr de û ji deşta Diclê tanî Terablosa rojava li rojhilat û rojava de dihate bidirêjkirin.

Di dewrana vegirtina Teter û Mengolyan de ji bona welatên musulmanîyê ji rojhilat tanî rojava û wêrankirina wan ji bona avanîyên jîrîtîyê û bajartîyê wehajî welatê

---

Kurdan jî nala hemû Dewlet û welatên musulmantîyê jî hate bivegirtin. Ew jî ji bona desthilatîya Wan vegirtvanên Wêranker ligel parastina xwedmoxtarîya xwe de bi neçarî ve hate bijêrdestkirin.

Di pişt re Îranîyan Kermensah û dorhêla wê ji xwe re dane bivegirtin û ew tev li welatê xwe dane bikirin. Lêbelê jî perçê herî gewre ji Kurdistanê ew bi xwe ve di nava Mîrmeşînên welatî de dihate biperçekirin, yê ku ew hin caran bi Hebûna xweyî Milî ve dihatin biparastin û hin carên din jî bi Xwedmoxtarîya xwe ve dihatin biparastin, tevî ku jî hin ji Dewletên Gewre ew ji xwe re dabûn bivegirtin.

Weha vê zînetê hanê bi vî rengê hanê ve date bidirêjkin, tanî ku Sultan Selîmê Turkî ceng li ser Şah Îsmayîlê Sefewî de date bidazanîn. Mîrên Kurd xwe tev li Sultan Selîm de dane bikirin. Ji wê rojê de Kurdistanê hêdî hêdî dest bi windakirina serxwebûna xwe ve date bikirin.

Tevî ku Netewê Kurd û Netewê Farisî herdu jî ji Arî têtin biderkevtin û ew herdu jî ji yek Bavikî têtin biderkevtin, tevî jî ku ew berî musulmantîyê di yek oldarîyê de dihatin biderkevtin, ku ew jî bi oldarîya "Zeradeshtîyê" ve dihate biderkevtin. Weha cudabûna rêçika oldarîyê di navbera herdu Netewên Musulman de hate biderketin, yê ku ew ji yek bunyad û Bavikî têtin biderkevtin. Piraniya Netewê Farisî ji xwe re bi mîrîtî ve Rêça Şîe date biwergirtin. Piraniya Netewê Kurd li ser Rêça Sune de xwe date bihiştin. Vê yeka hanê di nava wan de jilhevêdûrkirina rêçitî date biderkevtin, jiber di wê dewranê de dildarîyên oldarîyê li ser tevaya Welêt de dihatin bizalkirin û ew li ser tevaya dildarîyên dinî mirovanîyê de dihatin bivegirtin. Hiç li ser Kesekî de bi carekê ve

biveşartî ve nayête biderkevtin, ku heger dildarên Kurdayî oldarîyê dijî Şah Ismayîlê Sefewîyî Şîî bête bitevdan, dê dilên wan ji bona Sultan Selimê Sunî bêtin bilêdan. Hiç gûman têde nebû, ku dê ew tev li yê dawî de bêtin bikirin û dê ew bi tevaya germbûna cerk û hinavên xwe ve bi ser yê yekem ve xwe bidin birakişandin.

Sultan Selimê yekem giringbûna vê deqa hanê date binaskirin. Bi lez û bez ve û hêjî ew li Serbazxana "Amasya" bû, wî Zanevanê demê Hozanê Idrisê Bedlîsî, yê ku ew ligel wî de ji bona bi rêvebirina kar û baran ve dihate bidîtin, ji bona nik Mîrên Kurdistanê date birêkirin, jiber wan ew pir bi başî ve didan binaskirin û bi qencî û zanebûna wî ve ew pê dihatin birûniştin. Weha bi vî rengî ve vî Zanistvanê hanê kêşa Selimê yekem dijî Şah Ismayîlê Sefewî jiber cihê wîyî bilind di nava Mîrên Kurdan de û herwehaji agehdarîya wîyî pir li ser reweşt û sincîya Kurd de date biserxistin. Wetov tevaya Mîrên Kurd di şerê Çildêranîyî bi nav û deng ve tev li Sultan Selim de hatin bikirin. Ev jî bi xwe jî ve ji bona pêxistina reva pîs bi Sipahê Şah Ismayîlê Sefewî ve hate bihoyekirin.

Ev rûdana hanêyî giring di mêjûwa Turkî de nala destpêkirina belavbûna deshilatîya Turkên Osmanî di Asya navînî de tête biderketin. Herwehaji wergirtina wan navê Xilafetê bi vergirtina wan ve ji bona Misrê, ya ku ji bona wan cihekî mezin di cîhana musulmantîyê de date bidanîn, ew jî bi xwe ve yek ji encamên vî şerê dujwar bi xwe ve hate biderkevtin.

Wisa piştî bi dawî hatina vî şerê hanê ve û biserketina bi carekê ve ji bona Turkan bi yarmetîya vî Zanistvanê hanêyî dilsoz ve ji bona Sultan Peymanek di navbera Mîrên Kurdan de û Selimê Yekem de hate bigirêdan. Di vê

peymana hanê de Turkan Serpereştî li Kurdistanê de ji bona Mîrên Kurdan, yên ku ew Mîrneşîniyê ji Dondên xwe re li dû xwe didin bihiştin, her yek li Mîrneşîniya xwe de li gora Yasa û Reweştên kevnar de datin bihiştin. Li ser wan divabû ku ew Siphahên Serbixwe û di bin serpereştîya xwe de ji bona Dewletê bidin bipêşkeşkirin, gava ku ew ligel Dewleteke dinî mezin de bide bişerkirin û herwehaji divabû ku ew her sal komeke nişankirî ji peran ji bona xizna Dewletê bidin bidan. Weha bi vî rengî ve Kurdistan li gora vê peymana hanê de bi jêrdestî desthilatîya Osmanî ve hate bikirin. Sultan Selîm Fermanên li sermorkirî de bi bendên vê peymana hanê ve date biderkirin û pêrejî diyarî û xelat ji bona Mîr û Melan date bibelavkirin. Wehaji wî ji bona Idrîsê Bedlîsiyî hozan re ji Dîyariyeke pir mezin ligel Fermaneke Sultanî de date bitirxankirin, ya ku ew têde dildariya xwe beramber bi Şêx ve dide biderxistin û ew wî bi heşt Kirasên Teşrifîya Mezin ve ligel şûrekî pir bi nerx ve bi destikekî zêrê xurûyî zêrinî ve û 12000 Zêrên Dokî de dide bixelatkirin.<sup>3</sup>

Weha ev dewrana hanê ji mêjûwê nala bextiyariya Turkan û belavbûna Dëshilatîya wan di Asya û cîhana musulmantîyê de tete biderketin. Herwehaji pêrejî ev dewrana hanê ji nala jêrdestîya Kurdistanê di bin serdariya Turkan de dide bidestpêkirin û pêrejî ligelji de destanên Milî û belayên Civakî ji li ser Kurdistanê û Miletê kurdî belengaz de hêji ji wê çaxê ji de têtin bikirin.

---

<sup>3</sup>Li "Şeref Nama" farîsî di mêjûwa Kurdistanê de û mêjûwa Hammer ya Dewleta Osmanî bide temaşekirin.

## Ciyografiya Kurdistanê

### Serûşt û Av û Ba

Kurdistan ji gola Ormiyê ji jorî rojhilat tanî Meletyê di jêrê rojava de xwe dide bidirêjkirin. Weha dirêjbûna wêna nêzîka 900 Km û firehbûna wêna di navbera 100 û 200 Km de tête bidîtin. Ew bi heremeke çiyayî ve tête biderkevtin û ew di navbera Derca 34, 39 panbûnê de û di navbera Dereca 37 - 46 dirêjbûnê de tête bikevtin.<sup>4</sup>

Kurdistan bi çiyayên berzî bilind ve ji hemû semtan ji bil perçê jêrî rojava de tête bidorhêlkirin. Ev perçê jêrî rojava ji Banîyan tête bipêkhatin, yên ku ji wan kanî têtin biherikandin, û ji deştan, yên ku ew ji bal çeman de têtin biavdan. Baştirîn aliyên çandinîyê bi xwe ve ew bi perçê jêrî û jêrî rojhilat ve bi xwe ve tête biderkevtin, jiber çemê

---

<sup>4</sup>mêjûwa Hammer ya Dewleta Osmanî, Bergê çarem ji wergerandina Turkî.

Diclê û Firatê ligel rûbarên xweyî mîna Zabê mezin, Zabê biçûk û Xabûrê de tède têtin bidîtin.

Bilindtirîn çiyayên Kurdistanê ew di jêrî rojhilat de têtin bikevtin. Ew pir bi daristanan ve têtin bivegirtin û bi deştên nekêm ve ji bona çandiniyê bi pir baş ve têtin bidorhêlkin. Jiber vê jî Merov her û her wan bi Xelkê dagirtî ve di havîn û zivistanan de dide bidîtin û bi gund û bajaran jî ve ew têtin bitijekirin. Rêza çiyayên di navbera sînorên Turkî û Îranî de ew bi xwe jî ve bi kal ve têtin biderkevtin, ne daristan û ne jî şînayî di nava wan de têtin bidîtin. Ew ji tehtên hişkî agirpijî xwedan lêj, rik û zinarên pir bilind têtin bipêkhatin. Weha ev perçeyê çiyayî hanê li ser de bi hêztirîn û mêrxastirîn Sipah girtina wî nayête bidîtin.

Tevlivêjî piraniya çeman û rûbaran jî ji van aliyên hanê mîna Firatê û rûbarên wî û Diclê û rûbarên wî têtin biderkirin. Hemû ev çemên hanê ber bi jêr ve têtin biherikandin, ji bil çemê kutûr rûbarê ker de ew bi xwe ve ji bona derya Qezwînê tete biherikandin. Wehaji hin ji rûbar û cihokên pir jî hin ji wan ji bona gola "Wanêyî" bi nav û deng ve têtin biherikandin û hinên din ji bona rojhilatî gola "Ormiyê" têtin biherikandin, ya ku ew di nava welatê Eceman de tete bikevtin.

### Çandini

Tevî ku Kurdistan jî mîna heremeke çiyayî hatîye binavûdengkirin, lêbelê di rastîya rastîyê de ew bi xwe ve berî her tiştî bi welatekî çandiniyê ve tete biderkevtin. Li piraniya hêlên Kurdistanê de û nemaze li wan hêlan de,

yên ku ba û ava wan bi sargerm û xweş ve têtin biderkevtin, werz, rez, hemû rengên darên bergir û darên tuwan, yê ku ew ji bona xwedîkirina Kurmên Hevirmêşê û mêşên hingiv didin biyarmetîkirin, û bîstanên şîneyîyê û mêwe têtin bipirkirin.

Herwehaji li piraniya hêlên Kurdistanê ji de mîna li Diyarbekir, Mêrdînê û Sêrtê de rengên pir ji dûşabê "Hingivê Tirî" têtin bipeydakirin. Herwehaji Kurdistanê pir bi Lajwerd û mencemên xwe ve bi dewlemend ve têtin biderkevtin.

Li Kurdistanê de berên çandinîyê bi hemû rengên xwe ve têtin bipirkirin. Ji giringtirin berên çandinîyê evin:

Genim, ceh, garis bi herdu rengên xwe ve, tûtin bi baştirin celebên xwe ve, kitan, kindir, kuncî, pembo, reha mêkokî, mazû, pîvaz, sîr, fasolî, behîv, gûz, zirfisteq, hejîr, bindeq, zeytûn, sêv, hirmî, mişmiş, xox, hulî, gêlas, eloce, hinar, tirî bi hemû celebên xwe ve, tû û hêjbêtir ji mêweyên di welatên sargermî de têtin bidîtin.

Herwehaji pir berên çandinîyê dinji ji mewîj, hingiv, mêweyên zuhakirî bi hemû celebên xwe ve, doşabên şêrîn, yê ku ew ji mêwa hatine bigivaştin, şîma, penêr, doşab, rûn, masîyên şor û zuhakirî, desteyên pir baş ji hirîyê, ji çerm, ji zeytê, ji tovê kitanê, ji Kurmê hevirmêşê û pir rengên xavî hevirmêşê ji bona derve têtin birêkirin.

### Mencem û Lajwerd

Li Erxenê mencemeke mis -sifir- gewre xwedan navekî cîhanîyî mezin têtin bidîtin. Herwehaji li bajarokê Palo ji de mencemeke mis bi zîv ve têtin bidîtin. Li Silwanê de, li Cezîra Botan de mencemên komirê têtin bidîtin. Li hin



cihan ji wilayata Diyarbekrê de mencemên zêr û zîv têtin bidîtin. Li melbenda Sêrtê de dermanavên kebrîtîyî germ di zivistanê de û sard di havînê de têtin bidîtin. Herwehajî li ser kenarên Çemê Botan jî de bîr û kanîyên neftê jî têtin bidîtin. Wehajî li Madenê de li melbenda Sêrtê de mencemên hesin, gule -zirîng- û komirê têtin bidîtin. Li melbenda Nîrox de mencema zêr têtê bidîtin. Li nik "Wanê" de û di dorhêla wêna de Mencemên pir dewlemend bi komirê ve, bi gule ve, bi mis ve, bi perçek -qesdîrve, bi beraqis ve, bi neftê ve, bi Gêç ve, bi Gîre û çemento ve têtin bipeydakirin. Li nêzikî bajarê Arçîş û bajarokê Çolemêrgê de dermanavên kebrîtî têtin bidîtin. Li dorhêla Başqaçe de dermanavên hesinî têtin bidîtin û herwehajî di dola Zab jî de dermanvên sarî karbonî têtin bidîtin. Li melbenda Kîxê de mencemeke hesinî têtê bidîtin. Wehajî li bajarokê Kemax jî de mencemeke komirê û gule jî têtê bipeydakirin. Li melbenda Kîskîm de mencemeke mefreq û pola têtê bidîtin. Li Xinês de neft û mencemên gîre, gêç û yên din têtin bidîtin. Li Arzincan û Basîlî jî de gêç û gîre jî têtin bipeydakirin. Herwehajî li nêzikî Arzincan û Çiyayê Agirî Daxê jî de kanîyên pir ji dermanavan ji bona serşokan jî têtin bidîtin. Di naverasta Keban Maden de li wilayeta Xarpûtê de Mencemeke ji gule têtê bidîtin. Li Çemşekzik jî de mencemeke komirê têtê bidîtin. Herwehajî li melbenda Dêrsimê jî de pir kanîyên dermanavan jî têtin bipeydakirin, ku hêjî ne rengên wan jî û ne jî navên wan jî têtin binaskirin.

## Çêkirin

çêkirina ber û mehfûran li rojhilatî Kurdistanê de pir bi pêşketî ve tête biderkevtin. Ev pîşîsazîya hanê bi çêkirina cihî ve tête biderkevtin û pê Pîrek di dema xweyî valan de di nava şevên dirêj de xwe pê didin bimijûlkin. Herwehajî teşî û tevinkirin bi giştî ve tanî radeyekî bi pêşketî ve tête bidîtin. Hinin ji navên pertalên hirî, pemboyî û hevirmêş em didin bidan, ji yên Kurdistan bi wan ve tête binavûdengkirin: Perde, çarçev, hêzar, çapan, satan, pertel, çît, kitan, kunbar, kulav, rayîx, rajêr, tej, ber, mahfûr, ferş, peto, kejk, şal û şapik, pertelê bi tayên zîv û qesebê ve hatine bitevinkirin û desteyên destmalên serşokê têtin bidîtin. Herwehajî çêkirina çerm û gemarkariya wan bi hemû rengên xwe ve di nava Kurdistanê tête bibelavkirin. Herwehajî zêrîngerî, xişirkarî û gewherkarî li Kurdistanê jî de têtin bikirin. Nemaze xişirkirina çekan mîna destikên şûr, xencer, demançan li ser terzê rojhilatîyî kevin de têtin biçêkirin. Herwehajî sênîyên zîv, arîdankên zîv, darikên zîv têtin biçêkirin. Wisa jî karên li ser diranên fil de, li ser sîsem -Avenos- û li ser kehremanê zer û reş jî de têtin bikirin. Herwehajî zînkerî, dartiraş bi hemû rengên xwe ve tanî radeyekî li Kurdistanê de bi pêşveketî ve têtin biderkevtin. Wehajî li hin hêlan jî de çend sabûnkerî, rengreşî û hin ji karxanên din li ser terzê nuh de têtin bidîtin. Wehajî li Mêrdînê de renekî ji sabûna pir başî bi nex ve tête bidîtin. Ew ji zeyta fisteqa tête biçêkirin û jê re "Betûm" tête bigotin.

## Terş û Dewar

Em ji bona we amarekê bi dewlemendîya giştîyî Terş ve li Kurdistanê de didin bipêşkeşkirin, ya ku ew bi rêkirina wan ve ji bona welatên dorhêla xwe hatiye binavûdengkirin. Li Kurdistanê de 13 478 257 Serî mêşin, 8 185 899 serî bizin, 2 395 148 Serî dewar û 1 721 850 serî çêl têtin bidîtin.<sup>5</sup>

## serjima Xelkê

Gerjî çijî em di vî warê hanê jî de bîr û bawerîyeke bi carekê jî ve nikarin bidin biderkirin, jiber destik û destgehên têrkirî ji bona zanîna jimareke rast ji bona serjimara Xelkên Kurdistanê nayête bidestketin. Lêbelê tevliwêjî emê dê tişteki nêzîkî rastîyê bidin binavkirin. Evjî dê ji lêgerandina di hemû serjimarên pir de û texmînen cuda de bête biderxistin, yê ku ew tanî niha di vî warê hanê de hatiye biderkevtin.

Nivîsta Zerî Firensî der sala 1892 de dibêje, ku serjimara Kurdên li Turkîyê de neşînvani, ew bi 3012879 Kes ve tete biderketin.

General Zelençi di Serjimra Turkîyê de dibêje, ku serjimara Kurd li Turkîyê de bi 2 800 475 Kes ve tete bidîtin. Di Amarê de, ya ku ew ji bal Serdarîya Turkî de di sala 1919 de hatiye bibelavkirin, dibêje, ku serjimara Kurdan di yekê avdara sala 1914 de di wilayetên Wan, Bedlîs, Alezîz -Xarpût-, Diyarbekir û Erzeromê bi 2 527

<sup>5</sup>Li ferhenga "Agehdarîyê" ya Şemsdîn Samî bide bitemaşekirin.

840 ve Kes tête biderketin. Bi serdejî ve ew pê dide bivekirin, ku vê hanê hêlên din ji Kurdistanê bi ber xwe ve nedaye bigirtin.

Mîrza Wêtal Konyê di nivîsta xwe de der sala 1892 de di bin navê Asya Turkî de dibêje, ku Kurdên li Turkîyê de neşîvanin, ew bi 1928550 Kes ve tête biderketin.

Di Raportê Encumana pêkhatî de di bin Serokîtiya Kont Tilkî Serokê Wizareta bereyî Mecceristanê de hatiye binivîsandin, ya ku ew ji bona lêvenerandina daxwazên Kurdan û diyarkirina wan li ser fermana Girêdana Netewan de hatibû birêkirin. Ew raportê hanê der 16 tîrmeha sala 1925 de hatiye bibelavkirin:

Kurdan	
li Turkîyê	1 500 000 Kes
Iran	700 000 Kes
Îraq	500 000 Kes
Di Walatên din û Suryê jî de	300 000 Kes
Gîşt	3 000 000 Kes

Hiç gûman têde nayête bidîtin, ku ev texmînên hanê ji dadîyê û rastîyê pir bi dûr ve têtin biderkevtin, jiber Mîrza Alekzender Japa di nivîsta xwe de "Tevayek ji Çîrok û Rûnkirinên Kurdî", ya ku ew di sala 1860 de der Pêterburg de hatiye bibelavkirin, dibêje, ku Kurdan bi Xanî û Konên wan ve tête bitexmînkirin. Ew dibêje, ku her Xaniyekî yanjî Konekî jî 5 Kesan tanî 20 Kesan tête biderketin.

Weha bi vî rengî ve li ser vê rêzana hanê de em

dixwazin remaneke rast li ser Xelkên Kurdistanê de bidin bidan. Jiber vê jî me Naverasta di navbera jimara 5 û 20 de date biwergirtin, ku ew jî 10 tête biderketin. Me ev 10 bi jimara Xaniyan ve li bajaran û bi jimara konan di nava Êlan de date bilêdan. Weha li nik me de tête biderketin:

Kurdistana Turkiyê	3 987 960 Kes
Kurdistana Îraqê	749 380 Kes
Li Îranê	3 300 000 Kes
Li Suryê	289 940 Kes
Li komara Erministanê	60 000 Kes
Gîşt	8 387 280 Kes

Belê Merov dikare bide bigotin, ku jimara rast û nêzîktir ji bona rastiyê ew bi xwe ve jimara neh milyon bi xwe ve tête biderkevtin. Lêbelê ev hanêyî texmînkirî, ya ku me ew date bixuyanîkirin, serjimara Kurdên li dunyayê de belavikirî bi ber xwe ve nade bixistin, yê ku ew dibe serjimara wan li hêlên dunyayê de li dora milyonekê û bêtir de bête derkevtin.

### Ziman û Wêje

Zimanê Kurd mîna hemû zimanên Arîyî rojhilat ji Pehlevî, ji Sinsikrîtî û ji Mêdî tête bişaxkirin. Weha ev zinanê hanê berî musulmantîyê ji çep ber bi rast ve bi

Elifbayeke serbixwe ve dihate binivîsandin. Ew pir bi nêzikî Elifbaya Aşûrî û Ermenî ve dihate biderkevtin. Weha wê piştî musulmantîyê dev ji vê Elifbaya hanê date biberdan. Wê Elifbaya Erebi date bikaranîn, jiber ku ew bi Elifbaya Qurana Pîroz ve dihate biderkevtin.

Zimanê Kurdîyî niha ew ji bona çar zaravên cuda tête bibeşkirin. Ew jî evin: kurmancî, Goranî -Soranî-, Lorî, Kelher. Nêzîktirîn ji van zaravan ji bona Pehlevî ew bi xwe ve bi zaravê Lorî ve tête biderkevtin, jiber nêzîkbûna cihê Lorî ji naverasta Pehlevîyî yekemî û jiber ew pir bi Kildanîyan û Aşûrîyan ve nihatine bikêrkirin. Di piştî wê re li pêhev de bi nêzîkbûna xwe ve ji bona Pehlevî, Kelherî, Goranî û kurmancî têtin bidîtin. Lêbelêji herdu zaravayên dawî jî pir bi zimanên Aşûrî û yê Kildanî jî ve jiber nêzîkbûna wan bi wan ve hatine bipêkêrkirin.

Weha ji bona diyarkirina vê pirsiyarîya dijwar em li vê derê de givaştina nivîsandina Xwedîyê Ciyografîya Meltebron didin bianîn, yê ku wî bigir ji sedsalî li ser têgihîştina peyva Îran, yeran de, mîna ku ew li rojhilat de tête binavûdengkirin yanjî Îryanet, Aryanet, mîna ku ew li rojava tête binaskirin, û li ser pêşvexistina zimanên Iranî de, yên ku ew di nava Netewên Iranîyî xwedan bajartîyên gewre hatîye bikarhatin, dayîte binivîsandin. Ew dibêje: "ku Kevnaran di navbera Arîyan û Asqosîyan -Teteran- de didan bicudakirin, herwehaji wan di navbera gotina Toran û Îran jî de didan bicudakirin. Weha li ser avanîyên Istexer de gotina Aryane nivîsandî hate bidîtin, ku ew bi xwe vr ew navê Aryan bû, yê ku ew li nik Yunanîyan de dihate binaskirin. Lêbelê hin ji Zanistîvanên Yunan ev peyva hanê bes û bi tenha ve li ser rojhilatî Îranîyî niha Xuresan û Afxanistan didan bidanîn. Lêbelê Hêrîdot peyva Îranê li ser tevaya welatan dida bidanîn, yên ku ew di navbera

Çemê Sind û di navbera rojhilat û rojavayî deşta Diclê û Firatê de dihatin bikevtin; jiber Xelkê Mîdya jî bê gûman bi Arî ve dihatin binavkirin.

Ji kevintirîn zimanê Arî bi xwe ve ew bi zimanê Zend û Pehlevî ve têtin biderkevtin. Lêbelê zimanê Zendî ew bi xwe ve bi zimanê nivîsta oldariyî Îranîyî kevin ve dihate biderkevtin, ya ku jêre Zendevesta dihate bigotin. Weha ev zimanê hanê li hêlên bakurî Baniya Îranî ji rojavayî Buxara tanî Ezirbêcanê dihate bizalkirin. Wehajî hêjî ev zimanê hanê jî li nik Zerdeştîyan de di van Dewranên hanêyî dawî jî de tete biperestkirin, mîna ku zimanê Sensikrîtî jî hêjî ew li nik Zanistîvanên Hindî jî de tete biperestkirin. Weha ev rastiya hanê jî dide bipiştgirtin, ku ew herdu zimanên kevnar bi pir kokên ligel hev de têtin bibeşdarkirin.

Weha zimanê Pehlevî yanî zimanê Pehlevan û Şervanan, mîna ku ew tete bidiyarkirin, li Îraqa Ecemî, li Mîdya û li nik Parta -melbendeke Farîsî ye- jî de dihate bikarhatin. Weha hinek dibêjin, ku bes û bi tenha ve ev zimanê hanê bi tenha xwe ve dihate biderkevtin, yê ku ew di Qesir û Dîwanxanên Patîşahên Dûndên Kirûş de dihate bikarhatin. Belê di vî zimanê hanê de zor peyvên Kildanî û Aşûrî jiber hemsayî û hinera wan tete bidîtin. Weha nivîstên Zeradeştîyan ji kevnar de ji zimanê Zendî ji bona zimanê Pehlevî hatin biwengerandin.

Herwehajî bi vî zimanê hanê jî ve nivîsandinên neqîşandî ji dewrana Sasaniyan têtin bipeydakirin. Wisajî evaya jî dide biderxistin, ku ev zimanê hanê jî hêjî di dewrana wan jî de di Dîwanxanan de dihate bikarhatin. Lêbelê ji destpêkirina 211 z. tanî 632 z. hêdî hêdî wan nema zimanê Pehlevî didatin bikaranîn, yê ku li dû xwe wî jî wan re Meznahî û Jîrîtî date bihiştin. Ew ber bi çiyayê

Partê ve dihate biçûyîn û wan ji bona tevaya welatên Îranîyî jêrdestên xwe bi fermanên Patîşahî û qanûnên eşkere ve zimanê Partî -Farisî- yanî zarvayê herema Part -melbenda Şîrazêyî niha- dane bidanîn. Bi rastî jî ve ev zimanê hanê jî ew bi xwe ve him ji Pehlevî û him ji Zendî jî bi hêsantir ve tete bidîtin.

Gava ku Ereban welatên Îranî bicarekê ve bi jêrdestên xwe ve dane bixistin û Dewleta Farisî di sedsalê heftemî zayînê de dane binabûdkirin, wê çaxê, wê hingavê vî zimanê hanê sipehîbûn û qeşengbûna xwe date biwindakirin. Weha der sala 977 z. de di dewrana Dêlemîyan de gava ku wan vejandina yekekê ji zimnanê Iranîyî kevin xwedan bajartîyeke geş dane bixwestin, wê çaxê helbijartina wan li ser wî zimanê nîzîkî xwe û nuhatî de hate bikevtin, yê ku ew bi xwe jî ve bi zimanê farisî ve bi xwe ve dihate biderkevtin, yê ku navê wî berê niha hate biderbaskirin. Lêbelê wan di nava wî de datin bidîtin, ku bi kevtina pir peyvên Erebî û zimanên dinî dorhêlê rewşên wî hatine biguhertin û nîşanên wî hatine bihilanîn. Lêbelê Xweşxuyan û Peyvdaran ji vî zimanê hanê û ji zimanên dinî Îranîyî kevin mîna Zendî û Pehlevî -Kurdîyî Kevnarzaravayekî hêsan bi peyva xwe ve bi tîgihîştinên xwe ve pir dewlemend bi awazê pir xweş ve bi dengên xwe ve zimanek dane bihelbijartin, ku wan bi zimanê Farisîyî nuh ve dane binavkirin. Ev zimanê hanê nihajî li welatê Faris de hatîye bibelavkirin.

Wehajî Farisîya kevin him bi yarmetîya "Şahnama" Ferdosîyî bi nav û deng ve û him jî biyarmetîya nivîstên Zeradeştîyî oldarî hatîye bihiştin. Ew bes û bi tenha ve di nava nivîstên kevin de û di navbera Merovên oldarên Zeradeştî de tete biparastin û bihilanîn. -Li gotara Pêncî û Pêncan ji Pilana Asya Wergerandina Ciyografîya



Meltebronî Erebi, R. 121 bide bitemaşekirin-

Ji vê bi carekê ve têtê biderketin, ku Netewê Kurd ji kevintirîn Netewên Îranî têtê biderketin, ji yê ku wî di Banîya Iranîyî gewre jî de deritîyeke pir geş date bipêkanîn. Desthilatîya wî ji deşta Sind di rojhilat de tanî deşta Diclê û Firatê di rojava de date bidirêjkirin. Zimanî wiyî Kurdî bi navê zimanê Pehlevî yanî zimanê Pehlevan û Şervanan ve di tevaya Şahînşahiya Iranîyî pêşî de, ya ku ew ji bal Iskenderê Mekdonî de hate binabûdkirin, hate bizalkirin. Piştî vêna bi demeke kurt ve Dewleta Keyên Tîrikan hate bipeydakirin, ya ku jê re di nava mêtûwên farîsî de bi navê Dewleta Aşkanîyan têtê binavkirin, yê ku ew li ser Serdariya Iranî de demekê hatin birûniştin, tanî ku Keyê herema Farîsî zora tevan date bibirin. Wî Şahînşahiya Iranîyî hîmkirî date bipêkanîn û ew di pişt re bi navê Sasanîyê hate binavkirin. Weha bi vî rengî ve peyva "Faris" mîna peyva "Îran" li ser hemû Îranê de çî kevin yanî çî nuh jî dihate bikirin. Wehî jî bi vî rengê hanê jî Şahînşahiya Iranîyî pêşî jî bi Farîsî ve hate binavkirin, tevî ku ewaya jî bi xwe jî ve bi Kurdîyî Pehlevî ve dihate biderketin. Tevî ku jî Netewê Farîsî jî pir kevnar di Jîrtîya Iranî û Mezinbûna Farîsî jî de têtê bidîtin, lêbelê jî hê jî ew xorttir ji Netewê birayê xweyî Kurd têtê bidîtin, jiber Netewê Kurd li pêşîya wî Jîrtîya Iranîyî pêşî de date bipêkanîn.

Weha pîraniya Wêjevan û Zanevanên Kurdan nivîsandinên xwe piştî musulmantîyê di huner û zanistîyan de ne bi zimanê xwe ve datin bidanîn, lêbelê wan ew bi zimanê Farîsî, Erebi ve û di dawî jî de bi zimanî Turkî ve datin bidanîn. Tevlê jî jimareke nekêm ji zimanê xweyî welatî jî ji mêtûwên vejandinên xwe û encamên remanên xwe nedan bijibîrkirin. Wan li paş xwe de ji bona me

destnivîsandinên Kurdîyî mezin di berên cuda de ji huner û zanebûnê datin bihiştin.

Em li vê derê de bi hin navên Dengdaran ji Wêjevanan ve, yê ku wan bi zimanê Kurdî ve dane binivîsandin, jiber metirsîya dirêjbûnê didin bitêrkirin. Jiber bi dirêjî ve li ser wan de nivîandin dê her yek ji wan bi xwe jî ve Nivîsteke bi serbixwe ve bide bipêwistkirin.

### Alî Herîrî

Ew di sala 1009 z. de li bajarokê Herîrê li melbenda Hewlêrê de hatiye bizayîn. dîwaneke wîyî bi nav û deng ve û pir Xweşxuanên wîyî zor ciwan têtin bidîtin. Ew li bajarê xwe de hate bimirin û li wir jî de ew hate bineşînkirin. Gora wî pir bi nav û deng ve têtê biderkevtin û herwehaji pir lê têtê biserdanîkirin.

### Melayê Cezîrî

Navê wî Şêx Ahmede û ew bi wî navî ve hatiye binasîn. Ew ji Xelkê Bota ye. Pir Qesîdên wîyî zengilî di avîn de, di Xwedayê de û di sofitîyê de têtin bidîtin. dîwaneke wîyî pir şêrîn bi Xelkê ve têtê bipeydakirin. Ew der sala 1160 z. de li Cezîra Botan hate bimirin û ew li wê derê de hate biveşartin. Gora wî li wê derê de zor bi nav û deng ve têtê biderkevtin û pir lê têtê serdanîkirin.

## Feqê Teyran

Navê wî Mahmûde. Ew ji Xelkê Bajarokê Meksê ye. Ew di sala 1302 z. de ji bona dunyayê hatiye bizayîn. Du dîwanên wîyî mezin têtin bipeydakirin, yek bi nav "Şêxê Senanî" û ya din bi navê "Çîrokên Bersîsa" ve têtin bidîtin. Herwehajî dîwaneke wîyî dinjî bi nav û deng ve tête bipeydakirin, ew di bin navê hespê reş de hespê Pêxember de, li ser wî silav, yê ku ew bi navê Buraqê ve bi denge, tête bidîtin. Ew nivîsandîna hanê pir di nava destên Xelkê de tête bidîtin. Herwehajî dîwaneke wîyî din jî bi navê "M. H." di sofîtîyê û yekîtîya hebûnê de tête bidîtin. Ew der sala 1376 z. de li bajarê Meksê hate bimirin û ew li wê derê jî de hate biveşartin.

## Melayê Batê

Ew Mele Ahmede, bi navê Batê ve bi nav û denge, beramber bi navê gundê Batê ye, yê ku ew jî ji gundên Hekarê ye. Ew der sala 1417 z. de hatiye bizayîn. dîwaneke wî li ser çîroka zayîna Pêxember de, li ser wî mêj û silav, û herwehajî dîwaneke wîyî din jî di nava destên Xelkê de têtin bidîtin. Ew der sala 1492 z. de hate bimirin.

### Ahmedê Xanî

Ew Şêxê Hozanê Zanevanê Xweşxuwawanê avîndarê bê hempa ye. Ew ji Eşîra xanîyane û Xwedîyê dîwana "Mem Û Zînê" ye, ya ku ew bi xweşxuwaniyê çîrokî ve hatiye binivîsandin. Ew çîroka hanê di warê xwe de bê nimûne ye, bes û bi tenha ve Ilyaza Homîros jêre him ta ye û him jî hempa ye. Wî ev nivîsta hanê li bajarê Beyazîdê di sala 1591 de date binivîsandin. Namilkeyeke wîyî din jî di zimanê Erebi û Kurdî de bi navê "Nûbuhar" ve tête dîtin. Herwehaji zor nivîsandên wî bi Erebi û Turkî jî ve têtin bipeydakirin. Herwehaji ew pir ji bona hunerên sipehîbûnê ji bil xweşxuwaniyê û sirûdan jî dildarbû. Ew der sala 1652 z. de hate bimirin. Dilovanî û mehrebanîya Xwedê li ser be. Ew li tenîsta wê mizgeftê hate biveşartin, ya ku wî ew li bajarê Beyazîdê de dabû biavakirin.

### Ismail

Ew ji Xelkê Beyazîdê ye. Di sala 1654 z. de ji bona dunyayê hate bizayîn. Ew jî ji Xweşxuwawanên evîniyê çîrokî ne. Wî bi pê Şêxê Xanî ve dida bibidan, Xaniyê ku ew Homîrosê Kurd û Ferdosê Farişî bû. Ferhengeke wîyî biçûk bi zimanên Kurdî, Farişî û Erebi ve bi navê "Kamzar" ve tête bidîtin. Herwehaji pir qesîdên wîyî zengilî û xweşxuwanan wîyî qeşeng bi zaravayê kurmancî ve têtin bipeydakirin. Ew der sala 1709 z. de hate bimirin û li Beyazîdê de tirba wî pir bi nav û denge.

### Şerîf Xan

Mîr Şerîf Xan ji Mîrên Hekarê bû. Der sala 1689 z. de li Bajarokê Çolemergê navîna Hekarê de ji bona dunayayê hate bizayîn. Pir pexşan û helbestên wî têtin bidîtin û herwehaji dîwaneke wîyî pir qenc jî tete bipeydakirin. Destekî wîyî dirêj jî di nivîsandina helbestên Farisî jî de hebû. Ew di sala 1748 z. de li bajarê Çolemergê de hate bimirin û ew li wê derê jî de hate biveşartin.

### Murad Xan

Ew ji Xelkê Beyazîdê ye. Di sala 1737 z. de ji bona duyayê hate bizayîn. Pir nivîsandinên wî û helbestên wîyî ciwan di sofîtiyê de di helbestên Evînê de têtin bidîtin. Ew der sala 1784 z. de hate bimirin.

### Alî Terkmukî

Ew yekeke ji Zanistvanên hêja û Mamosteyên Mezin tête biderkevtin. Der sala 1000 k. de li gundê xwe de, yê ku ew di navbera Hekarê û Meksê de tête bikevtin, ji bona dunyayê hatiye bizayîn. Destekî wîyî balayî dirêj di zanistîyan û huneran de, nemaze di hunera sipehîbûnê de dihate bidîtin. Kêfa wî pir ji xwendindanê re dihate bidîtin. Wî nivîstek li ser rêzimana Kurdî date bidanîn. Pir Serdanên wîyî bi nerx ve ji bona welatên dorhêlê hatin bidîtin. Wî di wan serdanên xwe de li ser pir tiştên bi sûd û rûnkirinên pir hêja ve date biaxivtin. Gora wî di wî gundê de tête bidîtin, yê ku ew têde ji bona dunyayê hatîy bizayîn.

### Mela Yûnisê Helakatînî

Ew Xwedîyê her Sê Nameyên Kurdîyî bi nav û deng ve ji bona fêrbûna zimanê Erebi di "destûra ziman" de di "Nîr" de û di "Siwarkirinê" de tête biderkevtin. Gora wî li gundê Helketine de tête bidîtin, yê ku ew li wir de ji bona dunyayê hatiye bizayîn.

## Kurd û karên wan ji bona Bajartîya Misulmantîyê û Zanyarîya Erebî.

Pir kêr ji Xelkê dinasin, bi çî karên mezin û gorîyên gewre Miletê Kurd, Rêberên wî, Sersipahên wî û Zanistvanên wî di dewranên mêjûyî cudayî musulmantîyê de li pênavê liberdanê ji bona jîrîtîya musulmantîyê û Zanyarîya Erebî de dane bikirin. Heger Merov awirekê ji bona nivîstên mêjûwîyî giringî musulmantîyê bide biavêtin, nemaze ji bona wan nivîstan, yên ku ew di nava xwe de pir rûdanên siyasî, cengîni û bi serdejî ve li ser zînetê civakî û pêşvexistina zanistîyan û hûneran de didin bigirtin, dê pir bide bidîtin, yên ku ew didin biderxistin, bê ka çend destê Kurdan di destpêkirina derketina jîrîtîya Musulmantîyê de û di dewranên cudayî de di piştî wê re di piraniya berên jîna civakî, siyasî û zanistî de şopên diyar li dû xwe dane hiştin. Li vê derê jî cih jî nayête dîtin, ku bi dirêjî li ser pêrabûnên wan di destpêkirina pêkhatina Dewleta Abasiyan de bête biraxistin, jiber ew li Faris û Îraqê jî de bi hêzên kêrdar ve dihatin biderkevtin. Lêbelêjî dide bitêrkirin, heger ku em Serdarê mezin Danerê Dewleta Malbata Abas "Bavê Musulmê Xuresani" bidin bibîrxistin. Ew ji Mirovên Kurdên bi pir nas ve tête biderkevtin. Hiç gûman têde nayête bidîtin, ku Milîbûna wîyî bi nav û deng ve dîdarên Dewletê di musulmantîyê de date biguhertin û rojgara zêrîniyê di zanistîyê û avaniyê de date bilikarxistin. Di piştî wî re "Mîr Ahmed Lawê Merwanê Kurd" Danerê Mîrmeşîniya Merwanî li Farqînê û Diyarbekrê de tête bidîtin. Wî pir bi başî ve li ber dest-

hilatîya Xelifan de dida bidan û ew her û her li ber bi-hêzkirina Peyên Turkan de dihate birabûn. Weha bi vî rengî ve dilsozîya karên wî jî ji bal Xelîfê Abasîyî Hemdemê wî Al-Qadir Bil-Lah de pê hate birûniştin. Wî ew bi nav û nîşana bi Serketvanê Dewletê ve date binavkirin û bawerîya xwe pê date bidan. Weha ji bona vî Mîrê hanê û Cîneşînên Wî şopên pir bi nav û deng ve di nava jîrîtiya musulmantîyê de li welatê Diyarbekrê, li Farqînê, li Mêrdînê û li yên din de têtin biditin. Mêjûwa Ereban navanîn û danaskirina Gewreyên Kurdan nedaye bijibîrkirin, jêyên ku wan nivîsandinên xwe bi Erebi ve di warên cuda de ji zanistî û hunerên musulmantîyê di ayînrê û yasan de, di yekîtîya felsefê de, di mêjû de, di jîyannamê de, di rûdanên mêjûwê de, di hişmendîyê -locîk- de û di Peyvên Pêxember de dane binivîsandin. Nîvîstên wan di xwendegehan de li Bexdê, li Qahirê, li Mekê û Medîne, li Isfehan, li Meraxê, li Bedlîsê, li Amedê, li Şamê, li Helebê, li Şehrezorê herema Sulêmanîyî niha de û li Paytextên dinî musulmantîyê de çend heyaman dihatin bixwendin. Welatê Kurdistanê di rojgarîya Abasî de ji bona Xilafetê di rûwên Şapê Romê de bi xutirîn Keleh ve dihate biderkevtin, yê ku ew li ser tixûbên welatên musulmantîyê de li ser dirêjbûna Çemê Furatê de ji bakur tanî dûrtirîn rojava li Bîreçekê de dihate biditin. Weha ji Perçeyê rojavayî Kurdistanî neha re di wê çaxê de welatê Şikeftan dihate bigotin. Têde Şervanên Bawermend ji Xelkên wî welatî û yên din ji Musulmanan dihatin bicihkirin. Weha Merov niha welatê Kurdan bi Keleh û Dûzan ve tije dide biditin. Weha bi vî rengî ve li gora zanebûna niha de Merov dikara welatê Kurdan bi "Kelehên pêşîyî musulmantîyê" ve bide binavkirin. Weha li vê derê de li ser pêrabûnên Dewleta Ayûbîyî Kurdîyî Mezin



de bi Pêwist ve nayête bidîtin, ku li ser de bête biaxivtin, ya ku ew ji bal Neşîvanê Buhuştan, Dilovanê Xwedê, Sultan Selah Edînê Eyûbî de hate bipêkhatin. Alên wê li Misrê, li welatê Şamê, li Kurdistanê, li Hicazê, li Yemenê û Terablosa rojava de dihatin bihejandin. Weha Mêjûvanan di kevnar de û di niha jî de bi têrbûn ve der barê vê Dewlata hanêyî Musulman de ji herdu aliyên Sîyasî û Cengîni de dane binivîsandin, bi me ve nema bi pêwistî ve tete bidîtin, ku em bi dûr û dirêjî ve li ser şop û lidûxwehiştinên wê de bidin binivîsandin. Heger Xwendevan li van hindikan de ji jîyannama Kurdayî siyasî û zanistî di rojgarîyên cudayî musulmantîyê de bide bitemaşekirin, heger wî jî hinek ji Nûçeyên wanî di rûpelên mêjûwa musulmantîyê de ji yên belavkirî jî, yên ku ew bişaşbûn ve bi Farisan ve dihatin bigirêdan, pêve bide bivekirin, yên ku ew divabûn bi nivîsteke taybetî ve li wan de bihata bigerandin, wê çaxê dê li ser wî de nehata bidijwarkirin, ku bide bibiryarkirin, ku Kurd tanî pêleke nêzik jî ji demê di avanîya Dewleta Musulmanîyê de, di pêkanîna jîrîtîya -şahristanî- wê de û di firehbûna zanebûnên wê de sitûneke xurt didan bipêkanîn. Weha niha li ser me de divî ku em careke din ji bona mebesta xwe bêtin bivegerin, ya ku me ji bona wê bi lez û bez ve ev lênerên hanê jê re dane bidanîn, da ku em rewşa nihayî Kurd bidin bixuyînkirin. Bê ka çend rengên zordarîyên Turkan li ser Kurdan de têtin bikirin û bê ka çawan ji wan zordarîyên hanê şûreşên li pê hev de têtin biderketin, ku hîç gûman tede jî nayête bidîtin, ku dê ev Miletê hanê bi darê zorê ve bi mafeyê xweyî serxwebûnê ve di ayinda nêzik de pê bête bigihaştin, heger Xwedê date berêkirin.

Em gûman dikin, ku berî em bi dûr û dirêjî ve li ser mêjûwa şûreşên Kurd de li ser Turkan bêtin biçûyîn. Bi

baştir ve têtê bidîtin, ku em rabûn û rûniştinên Kurd û sincîya wî bidin binasîn. Wê çaxê wê hingavê dê li ser Xwendevan de tarîya cudabûnên Kurd û Turk bi hêsanî ve bête biliberketin. Wehajî jiber ku mebest bi Miletê me ve têtê bigirêdan, me bi başî ve date bidîtin, ku di vî babetê hanê de ji Peyvên Biyanîyan bidin bihîstin, yên ku wan li ser Kurd û Kurdistanê de lê dane bigerandin.

## Hinek ji Peyvên Mêjûvan û Lêgervanên Firengî li ser Kurd de

Mîrza Alêksender Japa di nivîsta xwe de "Tevayek ji Rûnkinên û Nûçeyan li ser Kurd de", ya ku ew der sala 1860 de hatîye bibelavkirin, dibêje:

"Di nava welatê Kurd de di wê çaxê de jimareke pir mezin ji dibustanan dihatê bidîtin û mêldarî têde ji bona zanistîyan bi zor gewre ve dihatê biderkevtin. Di her şarekî de, di her melbendekê de yanjî di her gundekî de di welatê Kurd de kêmtir ji yek yanjî ji du, yanjî ji sê û hin caran jî bêtir dibustan jî Merov didate bidîtin. Serdar û Xelk bi dil û can ve pir li dibustan û Zanevanan dihatin bimiqatekirin. Herwehaji Mezin û Biçûkan jî pir rêz û rûmet der barê huner û zanistîyan jî didan bigirtin. Mamostên hozanî pir qeç li Cezîrê, li Amêdîyê, li Soran, li Sêrtê û cihên din de dihatin bidîtin. Ji bona wergirtina Govanama (Diplom) Lênsansê li ser her Xwendevanekî de divabû ku ew di duwanzdeh zanistîyên dibustaniyê cuda re bête biderbas-kirin. Weha dibustan, Mamoste û Xwendevan îro bigir bi çarkê ve nema têtin bidîtin yanjî hebûna wan pir bi kêm ve tete bidîtin".

Mîrza Nêkîtin der nivîsta xwe de "Rûnkinên li ser Kurd de" dibêje: "Ji bona bi kurtî ve li ser sincîya Milet bête bixuyanîkirin, divê ku em bidin bibîrxistin, ku Qehbexane bi carekê ve li nik Kurd de nayête binasîn. Jiber vê jî ji bona nîşandana wê divê ew peyvên Turkî bidin bikaranîn. Her Kurdek Malxoyê bi mala xwe ve tete biderkevtin û ew bi xwe ve bi pîrbûn ve bi mêldarîya anîna yek Jînê ve bi tenê ve tete biderkevtin. Pîreka wî di nava

malê de bi xwedan desthilatiyeke pir gewre ve tête bidîtin. Ew bi Kevaniya nava malê ve tête biderkevtin û tevaya Navmalîyan di bin destên wê de têtin bidîtin. Ew xwarinê li ser sifrê de dide bidanîn. Xwarin bêyî wê nayête bidanîn. Heger Mêrê wê li malê de neyête bidîtin, ew pêşwazîya Mêvanan dide bikin, wan dide bimêvankirin û bi azadî ve ligel wan de dide bipeyivandin. Ew ne mîna Pîrekên Musulmanan tête biçarçevkirin. Mêrkirin ji dil tête bikin. Bûk û Zave bi berî berbûkkirinê ve hevdû didin binaskirin, di dima ku Jinanîn li nik hemû Musulmanên din de bê dilê Bûk û Zave û di rêya hin Mirovên din re tête bikin.

Cotkarê Kurd di jiyana rojana xwe de pir bi jêhatî ve têtin biderkevtin. Merov behetî dimîne, gava ku Merov li hêlên kurdistanêyî dûr de tête bigerandin, Merov wê çaxê dibîne, bê ka çiqasî ji hêz û bînfîrehbûnê ji bona wergirtina dewlemndîyê ji çiyayên kal û rût hatine bikarhatin".

Wehajî di Insiklopêdyaya mezin -bergê 21- de hatiye binivîsandin. Evaya jî wergerandina wê ye: "Hezkerinên malîtiyê di navbera kurdan de pir bi pêşketî ve tête biderkevtin. Ew pir dilsozin, dilpakî û merdî. Jinên wan bêtir ji Jinên Turkan bi azadtir ve têtin biderkevtin. Ew bê çarçev têtin biderketin. Pîrbûna jinanînê ji bil li nik Dewlemendan de û pêve nayête bidîtin. Ew ji Turkan bi kîn ve têtin biderkevtin. Mirovê Kurd bêqam ji aheng û semawendan dide bihezkerin".

Mîrza Hanrî Bender di nivîsta xwe de "Gerek li welatê Kurd de" dibêje: "Bi kurtî ve Kurd Mirovên sipehîne, bi hêzin û jîrin. Piştî ku ew bi şehristanîyê -Kulturê- ve têtin biperwerdekerin, wê çaxê ew bêtir ji diraweseyên xweyî Turk têtin bibilindkerin"

Mîrza A. B. Son di nivîsta xwe de "Du sal der Kurdistanê de" dide bigotin: "Di wê roja ku şiyarbûna Kurd bête bivejandin, dê Dewleta Turkî li ber wê de bête biletletkirin".

Keşê Pol Bender di nivîsta xwe "Agromîya Kurd" de dibêje: "zimanê Kurd zimanekî qeşenge, bi dengên xwe ve bi lihevhatî ve tête biderkevtin, bi hêsan ve, bi rast ve, bi dewlemend ve û bi rengînî ve tête biderkevtin û bi hêsanî ve ew tête bifêrkirin. Bi nermbûna xwe ve dilan ber bi xwe ve dide birakişandin. Gotên pêşîyan têde pir bi sipehî ve têtin bidîtin û ew pir jî têtin bikarhatin. Ew bingehê tevaya peyivandinê û mîla wê dide bipêkanîn û bi rastî jî ve bi vê jî ve zimanê kurdî jî tête binîşankirin. Zimanê Kurdî zimanekî bi têgihîştina jînê ve bi xwe ve bi dewlemend ve tête biderkevtin û ew bi zimanekî hestyariyî xweşxuwani ve tête biderkevtin. Hestyari têde tevaya beran bi ber xwe ve dide bigirtin û ew tevaya serûştîyê jî ji xwe re dide biwergirtin".

Mîrza Martin Hartman di pirtûka xwe de *Fünf Vorträge über den Islam* -Pênc Gotar li ser Musulmantîyê de-, ya ku ew der Laypzig sala 1912 de hatiye biçapkirin, dibêje: "Di wê roja ku li ser serê Netewê Kurd de Merovê wiyî niyazmendkirî bête bipeydakirin, yê ku ew di nava wî de serpereştîyê û hêzê ji bona hevkarîyê li ser bingehê Ferhengê û şehristaniya Giştî de bide bikaranîn, wê çaxê wê hingavê dê Netewê Kurd di nava tevaya dunyayê de rêzlêgirtinê û dildariyê ji xwe re bide bidestxistin".

Mîrza F. Şamoyî, Mamostê di Amojgeha Asyayî de li Pêterburga berê de û Endamê Akadimîya zanistîya Şahîñşahî têde di pêşgotina wergerandina "Şerfname" de, ya ku ew bi mêjûwa kurd ve tête biderkevtin û ya ku ew der Pêterburg de di sala 1868 - 1875 de hatiye biçapkirin, dibêje:

"Di nava Miletan de, yên ku ew li hevdû de li ser gorepana cîhanê de hatinebiderkevtin, hinên ji wan yadgarîya wan ji bona nifşên dûr bi rêya şopên sipehî ve têtin biguheştin, yên li ser mezinbûna wanî kevnar de didin binîşandan, mîna ku li nik Miletê Misrî de tête bikin, yê ku welatî wî bi xwe jî ve mîna dergûşa felsefê tête bidîtin. Herwehaji Miletên din jî nala Yunan û Roman jî beramberî wan tevaya rêzgirtina me ji bona pêşveketina wan di huner, zanistîyê, şehristanîyê, qanûn û rêxistina wanî siyasî de tête bidîtin, jiber ku navê wan beramberî hemû mezinbûn û mêrxasîya di mêjûwê de tête bibêhempakirin. Herwehaji hin ji Netewan têtin bidîtin, ku wan bes û bi tenha ve dikarîbûn xwe li gora wêrankirin û nabûdkirinê de bidin binaskirin, ya ku ew pê li wan welatan de pê hatine birabûn, gava ku Êlên wanî tî ji bona Wêrankirinê û birçî ji bona talankirin û çetîtiyê di nava wan welatan re dihatin biderbaskirin. Weha bi vî rengî ve "Hûn" di rojgara Efila de û Megol û Teteran dane bikin, yên ku wan di bin Rêberîya Vekirvanê bi nav û deng ve Cengîzخان de yadgarîyên xwe di nava wan welatên fireh de, yên ku wan ew bi serketî ve dane bivegirtin, bi kanîyên xwîne ve li dû xwe de dane bihiştin.

Herwehaji hin ji Netewên din jî bi vê navdariya şeremezdar ve nehatine binavûdengkirin. Weha ew bi nîşanên Cengîni û Mêrxasîya Komekê ve ji Gewreyên Rêberên xwe hatine binavûdengkirin, yên ku wan di rêya

rûmet, serbilindî û dilsozîya hinekan de ji Merovên Patîşahên xwe li Asya û Afrîqya de dane bidestxistin, mîna ku ev li nik Kurd de hatîye bidîtin. Kurd navê wan di kevintirîn heyamên mêjûwê de bikarên pir mezin ve hatîye binavdarîkirin, yên ku "Restem" bi wan ve hatîye birabûn, yê ku ew bi rastî ve bi "Hêrkolîsê Îranî" ve tete biderkevtin. Herwehaji bi karên pir mezinî din jî ve ji yên nuhtir jî Kurd pê têtin binavdarîkirin, yên ku ew ji bal "Selah Edîn" û birayê wî Melek Adilê Mezin de hatine bikirin. Jiber ev karên hanê pêwendîya wan ligel hinekan de ji Pehlewanên Cengên Xaçperestîya duwem de -Cenga Xaçperestên Sêyem Werger Cuma- nala Filîp Ewgost, Rişard Dilşêr û Lozininiyan û hinên din ji gewreyên Merovên Cengê tete bidîtin, ji yên ku ew ji Serbilindîya Fileteyê têtin bijimartin.

Vî Netewê - Kurd - hanê jî nala Kerîm Xan bi dunyayê ve date bidan, yê ku ew di nivî dawîyî sedsalên hijdehan de bi "Tîtosê Îranî" ve hate biderkevtin. Herwehaji wî pir ji Gewreyên Mêjûvanan û Wêjevanan nala Ibin Al-Esîr ji Cezîrê, Abû Al Fidayê bi nav û deng Keyê hemayê Ayûbî ve, yê ku ew nala Mêjûvanekî û Ciyografekî hate binavûdengkirin û Mêjûvanê li ser xwe de Idrîsê Bedlîsî bi dunyayê ve date bidan".

## Destpêkirina Pevçûnê di Navbera Kurd û Turkan de

Me berî niha date bixuyanîkirin, ku destekî Kurdayî mezin di serkevtina Selimê Yekem de di şerê Çildêranêyî bi nav û deng de li ser Şahê Ismayîlê Sefewî de dihate bidîtin. Herwehaji bê çawan bi qenciya ragiyandina hozanê Îdrîsê Bedlîsê jî ve ew bi jêdestî fermandariya Sultan Selimê Yekem hatin bikirin û pêrejî ligel wî wan de peymanek datin bigirêdan, ku têde wan serxwebûna xweyî navxwe datin bipolarastin û di desthilatiya derve de jêdestî Xilafeta musulmantîyê hatin bikirin.

Niha em dixwazin bibêjin, Kurd di seranserî mêjûwê de ji hezar salan di pir rûdanên mêjûyîyî giring de di pir bûyînên demêyî bi tirs ve hatine biderbaskirin. Ew pir caran jî di pir şerên xwînavîyî de di nava Şahîşahîyên kevnar de bi gorî ve dihatin bikirin. Ew Kurdên ji destpêkirina mêjûwê de, yên ku ew bi sincîyên xweyî bilind ve pir bi nav û deng ve dihatin biderkevtin, ew her û her di dan û sitandinên xwe de ligel Turkan de pir bi baş ve dihatin biderkevtin. Ew ligel wan de di tevaya cengên Turkîyê de li rojhilat û rojava de bi xwîna xwe ve, bi malên xwe ve û bi çekên xwe ve dihatin bibeşdarîkirin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku di nava Goristanên Osmanîyan de, yên ku ew li Afrîqya, li welatên Erebi, li Ewropa de û li ber Bendena Vîyena de li Nemsî de têtin bibelavkirin, pir ji hestîyên Kurdan jî têde têtin bidîtin, yên ku ew li pênavê bi nav û dengbûna Sipahiya Turkî de



hatin bigorîkirin.

Lêgerandên mêjûyî li Kurdistanê de didin bieşkerekirin, ku rewş û zîneta wêna berî pêwendîyên wê ligel Turkên Osmanî de bi gelekî ji niha bêtir qenctir, baştir û bilintir ve dihate biderkevtin. Di bin nîrên Turkan de, yên ku ew bi hîç renekî ve ji bona mafeyê jîyana serûştî ji bona Kurd û Kurdistanê pê nayên birûniştin, Kurd jî nala hemû Miletên jêrdestî Imperatoriya Osmanî jî ji mafeyê xweyî serûştî bi bê pişk û par ve têtin biderkevtin.

Kurdistan berî çarsed salî ji pir alîyan de ji niha de bi pêşveketîtir ve dihate biderkevtin. Ji aliyê serpereştîyê de bi pêşverûtir ve dihate biderkevtin, Ji aliyê zanistîyê û sincîbûnê de bi berz û balatir ve dihate bidîtin û ji aliyê civakî û abûrîyê de bi zînet û jîyanneke xweştir ve dihate biderkevtin. Gava ku Turkan datin bidîtin, yên ku ew li ser zor û sitemê de û li ser bêbextîyê û wêrankirinê de hatine bişîrvekirin, bê ka welatê Kurdan çend bi dilxweş û bextîyar ve tete dîtin û Mezinên wan çend bi hêz û mêrxas ve têtin biderkevtin, wê çaxê, wê hingavê wan li ber çavên xwe de dane bidanîn, ku ew bi her awayekî ve vî welatê buhuşt bidin bitarûmarkirin. Jiber ku ew Turkên hanê hatine bişîrvekirin, çi gava ku ew li ser welatekî de bêtin bizalkirin, divê ew cihên wîyî xweşbûnê û bextîyarîyê bidin bikavil û biwêranîkirin û Reben û Belengazan bidin bibêcîûwarkirin.

Li ber Turkan jî de ji bona bi cihanîna vê remana xweyî bêbext ve rê jêre jî nehate bigirtin, Tevî ku di nava wan û Kurdan jî de Peyman û Sozên bi navkirîyî çûyî jî ve hatibûn bigêrdan û ne jî ku Kurdan jiber xwe jî bi hemû

azadîya xwe ve tev li wan de hatin bikirin û ne ji ku Kurdan di hemû cengên Turkan de bi can û malên xwe dane bigorîkirin. Weha bi vî rengî ve ew di şeweyên destdirêjkirina nava kar û barên hundurûyî Mîrmeşîniyên Kurdan de ji bona wêrankirina wan û nabûdkirina rewş û zinetên wanî welatîyî perest û reweştên wanî Gelêrîyî bi nerx ve weha wan xwe pê dabûn bişûtkirin, ku Papazê Siyasetêyî bi nav û deng ve Mîkyavilî Danerê rêzana "perçekirin û zalkirinê" beramebr bi wan Turkan ve dê Keyakî bê guneh yanjî Pakekî zorlêkirî bihata bidîtin.

Weha ev siyaseta şûtkirî li Kurdistanê de Sultan Sulêmanê Qanûnî date bidestpêkirin, yê ku li pê Sultan Selîmê Yekem de hate biderkevtin. Wîna di navbera Mîrmeşîniyên welatîyî Kurdan de hoyên pevçûnan date bidanîn û tovên kîn û berberîyê ji bona gûrkirina gelacîyê di navbera Mîrên Kurdan de date bitovkirin. Weha gava ku du Mîrên Kurd bi pêxîlên hev ve dihatin bikevtin, wî alîkarîya yê lawaz dida bikirin û wî yê bi hêz ve dida bina-bûdkirin. Di pişt re wî yê lawaz dida bipîskirin û wî ew didate jêdestkirin. Weha bi vî rengî ve du Mîrmeşîniyên welatîyî Xurt di yek çaxê de ji rûpelê hebûnê dihatin bihilanîn.

Weha di nivîsta "Munşeat Firîdûn" de, ya ku ew mîna nimûneyekê ji bona Wêjeyên Turkîyî Mîrî tête biderketin, Fermaneke derketî ji bal Sultan Sulêmanê Qanûnî de ji bona yekemîn Walîyê Turkîyî Nişankirî di pêla wî de ji bona Diyarbekrê têde tête bidîtin. Ji vê Fermana hanê tête bidiyarkirin, bê ka çawan Sultanê Musulmanan û Şûngirê Xwedayê dunyayê Kurd dida binavkirin, yên ku ew tev li Xilafeta musulmantîyê û Sultanîya Turkan de ji ber xwe û

bi nêteke pak hatin bikirin. Weha wî ew bi vê siwarkirina Farisî ve "Kurdehayê bed nihad" ango Kurdên bed bunyad dida binavkirin!

Weha em gûman dikin, ku weha ev dîldariya ji bal Sultan de ji bona Neteweyekî bêguneh ji bil dilsozî û hogirîya wî pêve ji bona Sultan bi dîyarî ve dide beşkerekirin, bê ka çend bedbextiyên mezin Felekê bi serê vî Miletê Hejar ve di nava destên wan de dayîte bixistin.

Weha li ser vê rêça siyaseta zordariyî vî Sultanê Turkiyî hanê de tevaya Sultanên Turkiyî din li pê wî de beramberî bi Kurdên xapandî ve li ser de dihatin biiçûyîn, tanî ku Mîrreşînîyên Kurd li Kurdistanê de bi carekê ve di sala 1847 de xweser bi bin desthilatiya Turkan ve hatin bikevtin.

Weha şopên avaniyê û nîşanên bajartiyê û şehristaniyî Kurdistanêyî pêşveketî bi saya serpereştîya Turkî hatin bihilanîn. Weha ev welatê hanêyî avayî bi burc û şarên xwe ve, geşkirî bi zanistî û hunerên xwe ve bi destên Turkan ve hate bikavilkirin. Vî welatê ku ji bona dunyayê Zanistvanên mîna Amedî, Heskêfî, Goranî, Lawê Suûdî Emadî, Lawê Asîrê Cezîrîyî Wêjevan û herdu Birayên wî, Lawên Hacib û Qadî, Lawê Xelîlkan, Bavê Henîfê Dinorî, Lawî Quteybê Dinorî, Alî Herîrî, Hozanê Idrîsê Bedlîsî û Lawê wî Bavê Fedil, Lawê Selahê Şehrezorî û hinên din ji Zanistvanên pêşveketîyî bi nav û deng ve di cîhana musulmantiyê de date bipêşkeşkin.

Ji roja ku pîyên Turkan bi ser axa Kurdîstana pak ve hate bikevtin, ji wê rojê de tebat nema bi wan ve hate bikevtin û bala wan her û her pêdihate bidan, da ku ew

zimanê Kurdan û Milîbûna wan bidin binabûdkirin û bi ferhenga wan ve, bi oldarîya wan ve û bi rabûn û rûniştinên wan ve bidin bigêrekirin. Weha Turkan tu ber li ber xwe de nedane biditin, da ku ew Kurdan bi nizimbûna Turkan ve di nezanîyê de, di kuştinê de, di sertbûnê de, di pêrabûna gewretirîn xwînrijandinê de bidin bigihandin, ji bil ku ew tevaya dergehên bajartiyê, zanebûnê û zanistîyan di rûwên Kurdan de bidin bidadan.

Belê ev rûdanên hanê li Kurdistanê de dihatin bikirin. Mîrmeşînîyên Kurd yek li dû ya din de dihatin bikevtin û ew hêdî hêdî ligel Şahsamanên Turkan de dihatin bipêvekirin. Lêbelêjî van bi carekê jî ve di nava cerk û hinavên Netewe jî de şopên hiştî û birînên bi avkirî ve li pê xwe de didan bihiştin. Helbesvanên Kurd tanî berî vegirtina welatê wan ji bal Turkan de her û her helbest bi sipehîbûna Kurdistanê ve, bi çiya û deştên wêyî şîn û kesk ve û bi sûlavên wêyî zîvî ve û bi çem û rûbarên wêyî pir bi av ve didan bigotin. Lêbelê piştî ku Kurdistan ji bal de Turkan hate bivegirtin, bes û bi tenha ve Helbestên wan li ser zordarîya Turkan û serbirînên wan de li Kurdistanê de dihatin bigotin û herwehaji li ser wêrankirin û kavilkirina wan de li Welêt de dihatin bigotin.

Helbestvanan di nava helbestên xwe de didatin bixuyanîkirin, bê ka çiqasî Turkan malwêranî bi serê Kurdan ve dane bianîn û herwehaji bê ka çiqasî jî wan soz û peymanên xwe beramberî Netewê Kurd li erdê de dane bixistin, da ku ew hebûna wîyî Milî bidin biherifandin û ferhenga wîyî welatî û musulmantî bidin bihilanîn.

Ji dêlva ku li Kurdistanê de surûdên bextiyarîyê ji bal her Kur û Keçekê de bêtin bisitirandin, weha Menalên

Kurd li ser surûd û helbestên kînê, şîyarbûnê û xwe jê vegirtinê de beramber bi Turkan ve hatine bimezinbûn, yên ku ew her û her nala Dujminên Kurdan dihatin bidanîn, yên ku wan ji bona bêbeşkirina Miletê Kurd ji xêr û bêrên Walatê wî, ji bona derxistina wî ji nava cih û warê wî, ji bona tar û markirina wî di nava Welêt de didan bikarkirin, da ku ew bi qîlên birçibûnê bêtin bidevlêkirin û bi seqema dujehê ve bêtin bipêvedan.

Weha bi vî rengî ve Turkan tevaya hêzên xwe didan bitirxankirin, da ku ew nav û bangên şûreşên Kurd bidin bireşkirin, yên ku ew di rûwê zordaryê de, sitemê de û Serdarên xwînrij de dihatin birakirin. Wan hemîşe ew bi destdirêjî û tepên Biyanîyan ve didan bigirêdan. Weha her yekê ku ew dixwaze bi rastiye ve bête bigihaştin, divê li ser wî de ew li rewş û zineta kîna di nava cerk û hinavên Kurdan de bide bitemaşekirin, ya ku zordariya Turkan di nava dilên Kurdan de li dû xwe de dayite bihiştin. Herwehaji pêrejî remana Toranî jî, ya ku ew ji bal Merovên "Turkiya Genc" de di bin perda civata Osmanî de hate bidurûstkirin û bicihanîn, di nava dilên Kurdan de wêjî hêjbêtir bizotên agirê kînê beramberî Turkan dayite bigûrkirin. Ew remana Toranî bi hemû sertbûna xwe û xwînrijîya xwe ve ji bal Komara Turkî de di sedsalên bîstan de hate bidazanîn û bicihanîn.

Tevî ku Turk jî bi carekê jî ve bi rastiya vê zordariya hanê jî ve pir bi başî ve didatin bizanîn, ya ku wan li dû xwe de di nava tevaya dilên Kurdan jî de dane bihiştin, bi serdeji ve her û her ew ji qazîveji li her cihî jî de bi hebûna destdirêjî û tepên Biyanîyan nav bidû ve didin bixistin û bi pakîya serpereştîya Turkî ve û bi başîya Siyaseta xweyî

hundurû ve didin bişabaşkirin, da ku ew pê rastîyê bidin bipoşandin û ronahiya Xwedê bidin bitemirandin, Xwedê ronahiya wî bête bipirkirin.

Weha pevçûna kurd û Turk pê hate bidestpêkirin û hate bizayîn. Ew ji wê roja şûm de, - ji wê roja ku Kurd tev li Sultan Selimê Yekem de ji bona bi serketina Sunî ve li ser Şîe de hatin bikirin-, jiber bêbextiya Turkan û devjêberdana wan ji bona Peyaman û sozan ji fermanên wanî sertî dir û ji serpereştîya wanî genî hate bidestpêkirin. Weha bi vî corî ve tanî ku hoyên gihandina vê encamê bêtin bihiştin, tanî ku Turk di bêbextiyê de û zordariyê de xwe didin bişûtîkirin û di kuştinê de, di sorgonkirê de û di bê cî û warkirinê de xwe didin bibextyarîkirin û mafeyê jîyanê li ser Miletêkî de didin binayînkirin, yê ku ew ji wan kevintir û bi gelekî jî ve ji wan merdtir tete biditin, hiç gûman tede niye, ku dê kînbûn li wê gorê jî de bête bibêtîrkirin, herwehaji dê şûreş li dû hev de bêtin bivêxistin. Weha bi vî rengî ve dê pêwendîyên Kurd û Turk di nava bazinêkî xwînavî de bêtin bidîtin, ku di pişt re jî nema ne aşîti û ne jî hajbûn dikarin bêtin bidîtin.

## Mêjûwa Şûreşên Kurd û Pêşveketinên wan

Mîrza B. Nêkîtîn di gotara xwe de dibêje, ya ku jêre di Kovara Mercure de france de di jimara yekê rêbenda sala 1912 de di bin nav û nîşana "hin ji lêvenerandin û rûnkirinan li ser Kurd de" hate bibelavkirin:

"Diyarkirineke bi dûr û dirêj ve li ser şûreşan de, yên ku pê Netewê Kurd li ser Turkan de pê hatiye birabûn, ji roja ku pîyên wan bi Kurdistanê ve hatine bikevtin, kar û barekî pirî dirêje û pê danîna Nivîste taybetî dide bidivakirin"

Nêta me li vê derê de ne ewaya ye, ku em mêjûweke dûr û dirêj li ser şûreşên welatî de bidin bidanîn, yên ku kurd bi wan ve li pênavê liberxwedanê de ji bona Milîbûna xwe û Hebûna xwe pê hatiye birabûn. Lêbelê em dixwazin Belavokekê li ser wan bidin bidanîn, da ku em Netewê Erebiyî Comerd bi Kurd û Kurdistanê ve bidin binaskirin, da ku em remaneke giştî li ser Pevçûnan de bidin derxistin, yên ku ew di navbera Kurd û Turkan de têtin bidîtin û herwehaji pêrejî tevaya vir û buxtanên Turkan bidin bitazîkirin, yên ku ew her û her dixwazin wan bi Pirsîyarîya Kurd ve bidin bivekirin. Weha bi vî rengî ve perda derew û bêbextîyan tête tarûmarkirin, ya ku wan li ser pirsîyarîya Kurd de dabûn bipoşandin, da ku rastîya sipî bi tav û bi ronahî ve bête bidiyarkirin.

Jiber vê jî dê emê bi bîrxistina girngtirîn şûreşên welatîyî Kurd ve, yên ku di vî sedsalên dawî de bi tevayî

ve bi wan ve hatine birabûn, pê bidin bitêrkirin. Herwehaji pêrejî dê emê hin ji dûr û dirêjîya cengên Mirê Cezîrê û Botan ji ligel Turkan de bi ser ve bidin bivekirin.

Di sala 1806 de Abdul-Rehman Paşayê Baban li şahrê Sulêmaniyê de bi şûreşeke mezin ve hate birabûn. şûreşa wî du salan date biajotin û piraniya caran jî di wan şeran jî de ew dihate biserkevtin. Lêbelê Abdul-Rehman Paşa di pêla şûreşê de hate bikuştin. Wehaji pêrejî şûreşa wî hate bidawîkirin, jiber Kes ji Serokan nebû, da ku ew cihê wî bide bidagirtin.

Di sal 1812 de Ahmend Paşayê Baban jî ji Malbata bi navkirî ve bi şûreşeke din jî ve li ser pê de hate birabûn. Herwehaji ew careke din jî di pir şeran jî de dihate biserkevtin. Wî xwe bi pesarên Bexdadê ve date bigihaştin. Hiç nemabû, ku ew wê bide bigirtin û tevaya hêza Turkî bi carekê ve bide binabûdkirin. Lêbelê Feleka mal wêran ev Serokê hanê bi Mamê wî Abdul-Rehman paşa ve, yê ku ew berî niha hate binavkirin, date bigihandin.

Di sala 1820 de Kurdên Zaza bi şûreşeke din ve hatin birabûn. Wê tanî Sêwasê li ber xwe de date bivegirtin. Ew çend mehan hate bidirêjkirin. Ew jî bi şikestinê û revê ve hate bidawîkirin, jiber azoqe û teqemeniyên wê hatin bidawîkirin.

Weha Şûreşgêr ji bona vegirtina xwe li çîyan de hatin bneçarîkirin û pêrejî şerên xwe didan bikirin, tanî ku ew bi carekê ve hatin biqirkirin.



Pir şûreşên din jî ji sala 1829 de tanî sala 1838 de li hêlên Hekarê, Rewandûzê û Torabidînê de hatin bikirin. Tevde bi carekê vê careke din jî bi ketinê ve hatin bidawîkirin. Herwehaji serhildana Mohemed Paşayê Kor jî ji Malbata Baban jî di nava wan salan jî de tete bidîtin.

Di sala 1830 de şûreşeke giştî li çiyayê Şingalê de hate bivêxistin. Wê sê salên rebeq date bidirêjkin. Pir can û mal tede hatin bigorîkin. Lêbelêji careke din jî ew jî bi ketinê ve hate bidawîkirin.

Di sala 1834 de Mîrê Bedlîsêyî bi nav û deng ve Şerîf Xan bi şûreşeke mezin ve dijî zordariyên, destdirêjîyên û tepên Turkî ji bona hilanîna bidestkevtiyên Mîrmeşînîya wîyî. Mezin date bidadan. Mîrmeşînîya wî hate binabûdkirin, jiber şikestinên ku ew pê di şûreşa xwe de bi wan ve hate bikevtin. Der sala 1821 de Mîr Bedirxan, yê ku di wê çaxê de hîjdeh buhar temenî wî bûn, Mîrmeşînîya Cezîrê û herema Botan di nava destên xwe de date bihildan. Ji roja hildana Mîrmeşînîyê ji bona nava destên xwe wî pê neda bitêrkin, ku bes û bi tenha ve ew li ber çavên xwe de bide bidanîn, bê ka çawan li ser wî divê bête bidîtin, da ku ew Mîrmeşînîya xwe ji dek û dolabên Turkan û dilbijandinên Dergehê Bilindiyî veşartî û eşkere bide birizgarîkirin. Lêbelêji pêrejî wî ji bona rizgarîkirina Kurdistanê bi carekê ve ji bin sepeştîya Turkîyî sitemkar û pêkanîna Hevgirtineke giştî di navbera Mîrmeşînîyên Kurdî cuda de dida biremankirin. Vî Mîrê dûrbîn bi dîtina xweyî tûj ve hoyê bi rastî ve ji bona bi serneketinên şûreşên Kurd û ketin û revên wanî lidû hev ve dida bidîtin. Ne ku jiber Kurd ji Turkan ji bona xebatê bi kêm karîntirin ve, yanjî jiber ku Turk bi carekê ve ji Kurdan bi hêztir ve

têtin biderkevtin. Lêbelê wî ew rastîya hanê di du hoyan de bi tenê ve didate bidîtin: 1. Nebûna Hevgirtina hêzên kurd li ser remaneke welatîyî bilind de. 2. Nebûna karxanên çek û teqemenîyê li Kurdistanê de. Wehajî jiber vê jî berî her tiştî jî vî Mîrê hanê ji bona bi serhevdana Gel ve û bi rêxistina rêzan ve di nava hêzên cuda de dest bi kar ve date bikirin. Weha wî Peyambar ji bona Serokên Kurdên dorhêla xwe datin birêkirin û wî ji bo wan ji bona hevgirtina giştî û karkirin ji bona rizgarîkirina Kurdistanê bi carekê ve date bibangkirin, jiber di wê hingavê de ji Mîrmeşînîya Botan pêve li Kurdistanê de bi serxwebûn ve nedihate bidîtin.

Weha van Serdar û Serokên hanê, yên ku navên wan tên, banga Mîr bi erê ve dane bibersivkirin û ligel wî de peymaneke perest bi dilşadî û mizgînî ve dane bigirêdan:

Mustefa Beg, Derwêş Beg, Mehmûd Beg -Xan Mehmûd- ji Serdar û Serokên wilayeta Wanê, Nur- Alla Beg Serdarekî Hekarê û Fetah Beg jî, yek ji Serokan jê, Xalid Beg Serdarê Xêzan, Şerîf Beg ji Serdarên wilayeta Mûşê û Hisên Begê Kor Serekê Eşîrên herema Qarsê û Acarê. Herwehajî Şêx Mohemed jî ji Xelkên Musilê û Şêx Yusiv jî ji Xelkê Zaxoyê - yên ku ew wê çaxê ji Zanavantîrîn Zanevanên kurdistanê dihatin bijimartin - ji bona hevgirtina perest didan bibangkirin û ew li tevaya Kurdistanê de dihatin bigerandin û wan peyv di nava Xelkê de didan bikirin û ji wan re hêvîya pakîyî Mîr didan bixuyanîkirin. Banga Mîr Bedîrxan ne bes tenê ji bona kurdên Turkî dihate bikirin, lêbelêjî ew jî ji bona Kurdên Îranê jî bi wan jî ve hate bigihaştin. Weha ji wan Mîrê Erdelanê -Ostandariya Kurdistana Farisî- banga mîr bi erê

ve date bibersivkirin û ew ligel wî de tev li peymanana perest de hate bikirin.

Weha kar û barên Mîr ne bes tenê li ser van karên siyasîyî hanê de dihate birawestandin, lêbelêjî di hem kat jî de wî xwe ji bona amadekirina Sipahî û Cengînî xwe dida bilikarxistin. Weha wîna li bajarê Cezîrê de bi xwe ve karxaneyeyeke ji bona çek û yekeke din ji bona barûdê date bipêkanîn. Wehaji wî dest bi rêkirina jimarekê ji Xwendevanan ve ji bona Ewropa date bikirin, da ku ew li wê derê de di çêkirina çekan de, di teqemeniyê de û di tevaya amadekirinên cengê de û di karanîna wan de bêtin bihînkirin û bişhrezakirin.

Herwehaji wî jî dest bi avanîya gemîyan ve date kirin, da ku ew wan li ser gola Wanê de bide bikarxistin.

Weha wîna di navbera pêlekê û ya din de hêzeke Sipahî bi ser Mîr û Serdarên wan Kurdan ve dida biajotin, yên ku wan berberîya bi serkevtina hevgirtina perest ve didan bikirin, da ku ew bi darê zorê ve ji bona xistina wan di nava wê de bide bikirin. Herwehaji di vê pêla hanê jî de li hevdû de hate birasthatin, ku Filêyên Mîrneşîniya Botan jî bacên xwe mîna hercar nema ji bona Mîr re datin birêkirin, weha wî hêzeke Leşkerîyî ji deh hezar Serbaz pêkhatî ji bona ser wan date birakişandin û wî ew bi başî ve datin bifêrkirin.

Ev kar û barên mîr tevde bi carekê ve bi Dergehê Bilind ve dihatin bigihandin. Ji hêz û hinera Mîr Bedirxan tirsê binê dilê Dergehê Bilind dida bigirtin. Weha wî ji bona lidarxistina Sipahekî ji bona vêxistina şer li ser Mîr de date bifermankirin. Lêbelêjî tevlivêjî Dergehê Bilind rêyên siyasîyê jî xwe re date bigirtin. Weha wî ji bona Mîr

Wênerên xwe ji Istenbolê û Diyarbekrê date birêkirin, da ku ew bîr û bawerîya wî bide binaskirin û wî bi sozan ve bide bihêvîkirin û sînorên Mîrmeşîniya wî bide bifirehkirin, beramberî ku ew dev ji remana yekitiya Kurd û hevgirtina Kurdistanêyî giştî bide biberdan. Lêbelê Ewropa, ya ku ew hîç bihnekî dudiliyê nade bikirin, da ku ew Sipahên xwe bi ser Netewên reben ve bide birakişandin, ji bona ku ew wan bi jêrdestên xwe ve bide bixistin û şûreşên wan bide bitemirandin, jiber ku ew xwedanên alavên nuhî kavilkirin û wêrankirinê bi hemû sertbûn û dirbûna xwe ve têtin biderkevtin, di wê rojê de bi navê Mîrzayê Îsa hate bihêkirin û bikelandin û wê li nik Dergehê Bilind de li ser şerê Bedirxan de li ser Aşûriyan de, jiber ku ew filehin, date pirotistokirin. Lêbelê Mîr Bedirxan bi dadwerîya xwe û wekhevîbûna xwe ve beramberî bi Xelkê ve bi bêcudabûn ve di nava oldarî û reha wan de bi nav û deng ve dihate biderkevtin. Wî ji roja wergirtina Mîrmeşîniyê bi destên xwe ve fermanek ji bona hilanîna reweştên neçarkirî li ser Xwedîyên Nivîstan date biderkîrin, mîna ku ew divabûn bi cil û bergên taybetî ve xwe bidin bigirêdan, ji siwarbûnê bêtin bipeyakirin, gava ku yekek ji wan pêrgî Serdarekî kurd bête bikirin û hinekî din ji reweştên kevnaî din jî date bihilanîn. Herwehaji wî jinanîn ji Ermenîyan û Aşûriyan jî pişt lê didate bigirtin.

Vî Mîrê hanê, yê ku wî weha ev kar û barên demokrasî dida bipiştgirtin, yên ku her Neteweyekî Zindî ji bona wan niha dide bikarkirin, Merov nikare di serê xwe de bide bixistin, ku vexistina şerê wî li ser Aşûriyan de ji bal koraniya oldariyê de hatiye biajotin. Jiber ku Mîr herwehaji ligel Kurdan jî de, yên ku wan banga wî ji bona Hevgirtina Kurdîyî Perestî jî bi erê ve nedidan bibersivkirin, bi xwe jî ve wî ew bi wê sertbûn û hişkbûnê

ve dane bireftarkirin, mîna ku wî ew ligel Aşûrîyan jî de date bireftarkirin.

Pêrejî ne hiştina nekokîyên Hundûrû di nava sînorên Mîrneşîniya xwe de, berî ku ew Siyaseta Hevgirtina Perest û serxwebûna Kurdî bide bicihanîn, ji bona wî yekek jî giringtirîn Erkan li ser de dihate bidîtin.

Belê Ingilistan di pêşî de û Firensa di pişt re li nik Deregehê Bilind de li ser vêxistina şerê Bedirxan de li ser Xelkên xweyî Aşûrî de datin pirotistokirin. Wan ew şerê hanê nala serbirîna giştî ji bona Aşûrîyan datin biderxistin û herwehaji wan bi dûrkirina Mîr ji Mîrneşîniya wî ve datin bidaxwazkirin.

Parastinên siyasî û serpereştîyê bi dirêjîya salê ve di navbera Seraya Dewletê û Dergehê Bilind de diçûn û dihatin. Ew pir bi başî ve li ser mebestên Mîr de agehdarbûn û wan bi tûj û wirdî ve çavdêrî li hemû livandinên wî de didan bikin. Herwehaji di nava Walîyê Diyarbekrê de û Marîşalê Anedolê de dihate karkirin, bê ka çawan dê dilbijandinên Mîr bêtin binabûdkirin û tevgera wî bête bigenîkin. Weha bi vî rengî ve destdirêjîya Ingilistanê û Firensa û tûrebûna wan jî ji bona Dergehê Bilind kêseke pirî qenc date bidan, da ku ew pêrabûnên tûj beramberî Mîr bide biwergirtin.

Nemaze piştî ku herdu Dewletan jî bona Serdariya Turkî sozê pêşkeşkirina yarmetîyên divayî di dema pêwîts de dane bidan. Weha Dergehê Bilind di xwe de mîrxasî date bidîtin, wî bi Marîşal Hafîz Paşa date bigihandin, ku ew Peyambirekî ji nik xwe, yê ku ew bi zimanê kurdî ve dizane, ji bona nik Mîr bide birêkirin, da ku ew jê nêtên wî beramber bi Xelîfe ve bide binaskirin.

Wisa Hafîz Paşa Merovek bi navê Mehmûd Efendî ve ji bona nik Mîr date birêkirin, da ku ew ligel wî de gift û goyê bide bikirin û bi navê Xelîfe ve ji bona çûna Istenbolê ji bona wî bide bibangkirin.

Hîç gûman têde nebû, ku di karîna Mîr de nebû, ku ew vê daxwaza Dergehê bilind bide bicihanîn. Ku ew ji ber xwe dev ji Mîrşeşînîya xwe bide biberdan, ay ku wî ji Bav û Kalan de Bav li dû Bav de dayite biwergirtin û ew bi destên xwe ve ronahîya dawîtîrîn Mîrşeşînîya welatî ji Mîrşeşînîyên Kurdîyî pir bide bitemirandin, yê ku ew ji bal tepên Dewletê de û nakokîyên hundûrûyî li Kurdistanê de hatin binabûdkirin. Jiber vê jî wî daxwaza Dergehê Bilind bi nayîne ve date bibersivkirin. Wî jêhatbûnên xwe ji bona li karxistina Leşkeran û peydakirina alav û destikên şer de date bipircarkirin.

Dergehê Bilind hêzeke Leşkerîyî gewre bi ser Mîr ve date bigişandin. Mîr di pêşîya pêşî de bi hêsanî ve ew hêza hanê date binabûdkirin. Wî pêwendîyên xwe ligel Dergehê Bilind de date bibirîn û serxwebûna xwe ji Dewleta Osmanî date bidazinîn. Weha wî Pûlên Kurdî bi navê xwe ve di sala 1258 koçê de dane biderkirin. Di rûwê wanî pêşî de "Mîrê Botan Bedirxan" weha hatibû binivîsandin û li rûwê din de "sala 1258 koçê" hatibû binivîsandin. Vekirî-nên wîna ji alîyekî de tanî bajarê Wanê û ji aliyê din de tanî Mehebad, Rewandûz û Musilê jî dihate bidirêjkirin. Wî Keleha Şîngalê, bajarê Sêrtê, Wêranşehrê, Siwêrekê û tanî bedena Diyarbekrêyî xurt jî date bivegirtin.

Di vê pêla hanê de şûreşek li Musilê hate bivêketin. Wî Leşkerê xwe ji bona parastîna xêza "Diyarbekrê -

Siwêrekê - Nisêbînêyî cengê date bihiştin û ew li ser serê hêzeke têrkirî de ji bona Musilê çû, da ku ew lê careke din aramîyê bide bicihanîn.

Di vegeza xwe de ji Musilê ji bona Baregehê Serdarîya xwe li Cezîrê de pêçek bi xwe ve wî ber bi rojhilat ve date bidan. Weha wî Mehebad, Sunc -Senendec- û Ormîyê li welatê Faris de date bivegirtin.

Lêbelê vê carê Dergehê Bilind xwe bi mezinbûneke pir giran ve dabû bilikarxistin. Wî tevaya hêzên xweyî bi rêxistî ve û yên din ji Jiberxwevanan û Başbozqên Anadolê date bidagirtin û di bin Rêberîya Osman Paşa de date birêxistin û ji bona rakişandina ser Mîr Bedirxan pê date bifermankirin.

Rêberê destê rastêyî vî Sipahê Turkîyî mezin Sergird Omer paşa bû û Rêberê vê bi rêxistinê Serleşker Sebrî Paşa bû.

Weha şerê pêşî di navbera hêzên Kurdî û vî Sipahê hanê-de li nêzikî Ormîyê de hate bivêketin û Mîr tede hate biserkevtin. Xebrek hate bigihandin, Ku Rêberê Sipahê Kurd Izedîn Şêr,yê ku ew ji Mirovên Mîr bû, tev li Turkan bûye û wî bi yarmetîya Sipahê Turkî ve bajarê Cezîrê Baregeha Mîrneşîniya Mîr dayîte bivegertin. Weha beramber bi vê rewşa hanê ve Mîr bi hiştîna hêzên têrkirî ve li pêş Turkan de li ser qada şer de pê hate bineçarkirin û wî bi hin hêzên dinî gewre ve ji bona şerkirina ligel Izedîn Şêr de û Turkên ligel wî xwe de date birakişandin. Piştî şerên xwînavî wî dikarîbû Turkan û Hevalbendê wan Izedîn Şêr ji Cezîrê bide biderkirin.

Lêbelê vê bêbextîya hanê ji bal Izedîn Şêr de nebes tenê Mîr Bedirxan ji jêkirina mêweyên bi serkevtina wîyî gewreyî pîrozî ve li ser Sipahê Turkî de li ser qada şer de li pesarê Ormiyê de date bibêparkirin, lêbelêjî bi serdejî ve bezandina hêzên Kurdîyî Rawestyayî beramber bi Sipahê Turkî ve li pesarê Ormiyê de wê date bihoyekirin, jiber hêza Sipahê Turkî bi tevlêbûna hêzên Turkî ve, yên ku ew ji Cezîrê hatibûn bibezandin, hate bixurtkirin. Weha Mîr Bedirxan hate bineçarkirin, ku ew xwe ji Cezîrê ji bona Keleha "Aroxêyî" sengîn bide bikişandin. Weha Turkan û ligel wan jî de Izedîn Şêr dor li Kelehê de datin bigirtin. Vê dorlêgirtina hanê heşt mehan date bidirêjkirin û her û her şer di nava van herdu bendan de dihate bivêketin.

Weha bi vî rengî ve rewş hate bidirêjkirin, tanî ku xwarin û vexwarin li kelehê de hatin bidawîkirin. Mîr bi pêrabûna hêrîşeke ji nişkê ji hundûrû ve hate bineçarkirin, lêbelêjî felekê vê carê jî bext pê neda bidan û ew pê tûşî bezeke pir pîs bû. Weha bi vî corî ve hêvîya wîyî bi تنها xwe ve li vê dunyayê de bi gihandina serxwebûna Kurdistanê ve bi carekî ve û hevgirtina wêyî giştîyî Perest hate bivemirandin. Wehajî Dergehê Bilind û Turk jî bi vî encamê hanêyî pir dilşewat ve pê hatin bikêfxweşkirin. Ji bona hiştina bîrwerîya wêna wan Midalîyek bi navê "Mêdalîya Cenga Kurdistanê" ve dane bidanîn. Li rûwekî wê de "Mêdalîya Kurdistan" datin binivîsandin û li ser rûwê din de Keleha Aroxîyî sengîn dane bineqîşkirin.<sup>6</sup>

---

<sup>6</sup>Li mêjûwa Lutfî Bergê 8, li mêjûwa Kurd û Ermenîyan ji bal Danerê wê Şapmîyan, a ku ew li Istenbolê di sala 1911 de hate çapkirin, li Nivîstoka "Nineva û Babêl", ya ku ew li London di sala 1853 de ji bal Danerê wê Sêr Hinrî Layard hatiye çapkirin, li Ferhenga Agehdarîyî Elemenî, li nivîsta "Komek ji Bîrwerî û Çîrokên Kurdî", a ku ew li



Der sala 1877 de di navbera Turkî û Rusya de ceng hate bivêketin. Dergehê Bilind pir ji Kurdan date biserbazkirin û Rêberîya perçeyekî gewre ji wan bi Zarwên Mîr Bedirxan ve date bisipartin.

Weha wan Rêberên hanê mîna Hisên Kenan Paşa û Osman Paşa ev kêsa bi nerx ve ji xwe re datin bigirtin û ew ligel Evser û Serokên di bin Rêberîya xwe de lihevhatin û wan bi hev re çûna ji bona Kurdistanê dane bibiryarkirin, da ku ew wê hêvîya bi rûmet ve "Yekitîya Kurdistan û Serxwebûna wê" bînin bicihanîn, ya ku têde Bavê wanî Gewre di cihanîna wê de nehate biserkevtin, mîna ku hate biderbasbûn. Weha ji bona bi cihanîna wê bîryarîya hanê ve ev herdu Mîrên Kurd di sala 1879 de bi dizî ve ji bona Kurdistan çûn û ji nişkêve wan xwe li nava Cezîrê de datin biditin û hevsarê kar û baran bi nava destên xwe ve dane bixistin û xweser wan serxwebûna Kurdistanê datin bidazanîn. Pîrî caran ew bi ser hêzên Turkîyî rakişandî ve bi ser wan ve ji hemû alîyan dihatin bikevtin. Vekirinên wan tanî Çolemêrgê navîna Hekarê, Zaxo, Amêdîyî, Mêrdînê, Midyadê û Nisêbînê hatin bidirêjkirin. Weha Mîrmeşîniya Gewreyê wan Mîr Osman hate bidazanîn û Navê wîna ji dêlva navê Sultanê Turkan di Peyvdariya Înê de dihate bixwendin.

Weha bezandina hêzên Turkîyî li hevdû de û belavbûna Desthilatîya Mîr Osman li tevaya welatê Kurdan de

---

Pêterburgê sala 1860 de ji bal Danerê wê Mîrza Japa Kunsulê Rusî der Erzeromê hatiye çapkirin û herwehaji li mêjûwa Mîrên Kurdan ji bal Danerê wê Şêx Sultan Memduh bide bitemaşekirin.

Sultanê Serdemê - Abdul Hemîd neçar bû, ku ew siyaseta xwe beramberî Kurdistan û Kurdan, nemaze beramberî Binemala Bedirxanîyan bide biveguhertin.

Weha Dergehê Bilind hate bineçarîkirin, ku ew tevaya Xelkên Binemala Bedirxanîyan bide biberdan, ji yên ku wî dabûn bigirtin. Weha Dergehê Bilind ji bona herdu Mîrên Xebatvan li Kurdistanê de date birêkirin, ku ew ji bona rawestandina xwînrijandina Musulmanan dide bibangkirin û ew ji bona bicihanîna dawxwazan bi rêyên aşîfî ve bi amade ve tête biderkevtin. Weha ev herdu Mîr jî bi van gotin û peyvên Bira û Merovên xwe ve pê hatin bixapandin, yên ku ew wê çaxê hêjî li Istenbolê de dihatin bimayîn, yên ku wan Siyaseta nermî Sultan didan biderxistin, ya ku ew vê dawîyê li ser diçû. Weha herdu Mîran ligel Turkan de li ser mercên lihevhatinê û bi cihanîna Daxwazên Kurdan de gift û go dane bikin. Hêjîbêtir bawerîya herdu Mîran bi Turkan ve li ser pêşewazîya wanî pir baş de di hemû civînan de ji bal Turkan de dihate bikin û herwehajî pêrejî peyvên Wênerên Turkan ji bona bi cihanîna daxwazên herdu Mîran ne bes tenê der babetê Mîrmeşînîya Cezîrê de lêbelêjî der babetê tevaya Kurdistanê bi xwe jî ve dihatin bikin, jiber wan didan biderxistin, ku ew dixwazin serxwebûna hundûrû ji bona Kurdistanê bidin bidan, lêbelê wan ew bi mercên pîrî poşandî ve bi tar û mij ve didan biderxistin.

Weha van dîdarên hanê tevan bi hev re ji bal Turkan de pir li nik herdu Mîrên Bedirxanîyan de datin bikêrkin. Wan jimara Peyên Pasevanên xwe dane bikêmkirin, yên ku ew ligel wan de ji bona hemû baregehê Kongire û Civînan diçûn. Turkan her û her cihê civînan bi zanebûn ve didan biveguhertin. Weha rojekê ji rojan di cihekî de

Kongire hate bigirtin, ku tède hêzên Turkan bi pir carî ve deha ji hêzên Kurdan dihatin bibêtirkirin. Weha Turkan ev kêsa hanê ji xwe re datin bigirtin, tevî ku ev tepa hanê jî bi xwe jî ve ji bal wan hatibû bidanîn. Hêzên Turkî dora herdu Mîran û Pasevanên wan datin bigirtin û ew herdu dane bidîlkin. Turkan herdu Mîr dane bigirtin û ew ji bona Istenbolê bi destgirêdayî ve dane birêkirin. Hiç gûman tède nebû, ku ew dê bi darvekirinê ve bêtin bidadkirin. Lêbelê metirsîya Sultanîyî jîr ji vêxistina gurîna agirê şûreşeyî giştî li Kurdistanê de ew ji vê remana hanê date bidûrkirin. Jiber vê jî wî bi avêtina wan ve ji bona binê zindanê ji bona demekê date bitêrkirin. Di pişt re wî ew dane biberdan, lêbelê ew divabûn li Istenbolê de bêtin bimayîn.

Der sala 1881 de Şêx Ubeydula li bajarê Şemdinan de bi şûreşeke xurt ve hate birabûn.

Wî daxwaza serxwebûna Hundûrû ji bona tevaya Kurdistanê li jêr desthilatîya Turkî de dida bikin. Weha di pêş de biserkevtin ji bona hêzên Şêx bi yarbûn. Lêbelê hêzên wî ligel hêzên Îranî de hatin biberengarîkirin û di nava wan de şerên pirî xwînavî hatin bilidarxistin. Di dawî de Şêx hate bikevtin û hêzên wî jî hatin bişikestîn. Ew hate bigirtin û ew ji bona Medina Munewer hate bisorgonkirin û ew li wê derê jî de hate bimirin.

Der sala 1889 de herdu Zarûwên Mîr Bedirxan Amîn A-lî Beg û Medhet Beg bi dizî ve dev ji Istenbolê datin biberdan û wan xwe bi Terabzûnê ve datin bigihandin. Wan li wî derê de dest bi nasîna Merovekî ve datin bikin, ku jêre Mustafa Nuri Afendî Al-Şamilî tète bigotin, da ku ew pêwendîya wan ligel Serokên Kurdistanê de bide

bilidarxistin. Weha bi vî rengî ve ew lihevhatin, ku hêzeke çekdariyî Mezin di bin Rêberiya hinekan ji Serokên Kurd de tanî cêhê, ku jêre Cuwêzlek dibêjin, di navbera nivê rêya Erzeromê û Terabzûnê çavdêriya herdu Mîran bide bikin. Wehajî bi rastî jî ve ew hêza li ser lihevhatî de xwe bi cihê navkirî ve date bigihandin û herdu Mîr jî ji Terabzûnê bi dizî ve wan jî xwe bi cihê navkirî ve datin bigihandin. Lêbelê Merovê, yê ku di rêya wî de pêwendî dihate bikin, ew di rastiya rastiye de ji Mikurvanên Sultanî bû. Weha wîna Dergehê Bilind date biagehdarîkirin, da ku ew bi lez û bez ve ji bona rêkirina hêzên Sipahiî gewre bi dizî ve ji Erzeromê û Erzencanê ji bona wan hêl û rêyan bide bifermankirin, yên ku divabûn herdu Mîrên bêagehdar di nava wan re bêtin biderbaskirin. Wehajî evaya jî bi xwe ve hate bikin. Bi vî rengî ve herdu Mîran xwe ligel hêzên ligel xwe de ji nişkêve di nava du hêzên Turkiyî gewre de li jêrî bajarê Payportê de datin bidîtin. Şerekî xwînavîyî pîrî giran di nava wan de hate bidadan, ku ew bi bezandina hêza Kurd ve ji bona çiyayên Erxenê û Madenê hate bidawîkirin û wan li wê derê de pîyên xwe datin bigirtin. Weha bi vî rengî ve cengê di nava wan de demkê date bidirêjkirin, tanî ku herdu Mîr bi berdestbûna xwe ve hatin bineçarîkirin, jiber hêzên Kurd hêdî hêdî dihatin bikêmkirin û gihandina hewaran ji bona Turkan ji hemû Semtan dihatin bigihaştin -li Insiklopêdya musulmantîyê de bi zimanê Fîrensî ve ji bal Minoriskî de û li nivîsta "Li ser Kurd de" ji Danerê A. Verionov bide bitemaşekirin.

Belê ev şûreşên hanê bi carekê ve hatin bikevtin û ne yek jî ji wan jî hate biserkevtin. Lêbelêjî tevlivêjî ew bê qazanc nebûn. Wan her û her pilingên agirê

welatperwerîyê di nava cerg û hinavên Kurdan de li hemû hêlên Kurdistanê de didan bivêxistin û bigûrkin. Wan hêvîyên mirî di nava dilên Kurdan de didan bizindîkin û agirê welatperwerîyê di nava dilên Netewê Kurd de li Kurdistan û Derve de ne dihiştin bêtin bitemirandin. Hêjî bi serdejî ve wan li nik Turkan de tirs û lerz di bicihanîna dilbijandinên xwe de bi carekê vê li ser Kurd û Kurdistanê de didan bikin.

Di sala 1913 de şûreşeke Kurd li wilayeta Bedlîsê di bin serokîtîya Mele Selîm, Şehab-edîn û Alî ve hate bikin. Vîrinên agirê wê jî xwe bi bajarê Bedlîsê ve jî datin bigihandin. Lêbelêjî tevlivêjî ew jî jiber pîrbûna hêzên Turkî û giranîyan wan jî li ser wê de bi ketinê ve hate bidawîkin. Serdarê wê Mele Selîm xwe li Şahbenderîya Rusî de li Bedlîsê de date bipenakirin. Ew têde ma, tanî ku Turkîyê li ser Rusya de ceng date bidazanîn, wê çaxê wê kês jî xwe re date bigirtin û Peyên wê Şahbenderîya bi navkirî ve datin bivegirtin û wan Mele Selîm datin bigirtin û ew li ser şeqamên Bedlîsê de li dar de dane bixistin.

Evaya givaştina kurtîya şûreşên welatîyî Kurdî bû, yên ku pê Mîrov û Binemalên cuda li Kurdistanê de dijî Serdarîya Turkî di sedsalê dawî de li pênavê liberxwedanê de ji bona rûmeta xweyî Milî û yekîtîya perestîyî Kurdistanê hatine birabûn. Me bi kurtîyeke giştî ve ew tanî berî Cenga Cîhanî Yekem date bibîrxistin. Ji bona we va ye, em kurte puxtekê li ser mêjûwa bizavên zanistî û karên siyasî de didin bipêşkeşkin, yên ku ew jî bal civatên Kurd de li pênavê mebesta Perest û "Yekîtîya Netewê Kurd û serxwebûna Kurdîsanê" de pê hatin birabûn.

## **Kar û Barên Zanistî û Xebata Siyasî**

Welatperwerên Kurd tevaya jîna xwe datin bitirxankirin, yên ku şikestinên hemû şûreşên Kurd ji bona wan bi destaneke pirî giran ve dihate biderkevtinb, yên ku ew ji bona Rizgarîkirina Kurd ji nava pencên Serdariya Turkî û bi cihanîna serxwebûna Kurdistanêyî hêvîkirî û yekîtiya wêyî Perest ve hatin bikirin, da ku ew li qadên Siyasetê û zanistîyê jî de bidin bixebatkirin, ku ew bêtir liberxistinê li ser vê mebesta bi rûmet ve bi xwe ve bidin bibelavkirin.

Weha bi vî rengî ve der sala 1315 k. de derkirina rojnameyeke Kurdî hate bibiryarkirin, da ku ji bona kêşa Kurd bête biragiyandin û Netewan û Dewletan li ser mebest û armacên wê pê bidin bigihandin. Bi rastî jî ve Mîr Medhet Bedirxan yekemîn rojnama Kurdî bi navê "Kurdistan" ve date biderkirin.

Weha di wê hingava hanê de civateke Kurdîyî bi rêxistî ve bi têgihîştina nû ve ne dihate bipeydakirin. Lêbelêjî tevlvêjî hestkirina giştî bi pir dilsoz ve Welatperweran li

vir û dera hanê jî de ji bona girtina civînan dida bipêwistkirin, da ku ew di nava wan de li ser welatê xweyî perestiyî talankirî û Netewê xweyî lêzorkirî û ji mafeyê xweyî bê beşkirî de bidin biaxivtin. Weha bi vî rengî ve rojanama "Kurdistanêyî" bi navkirî ve zimanê xwestiyên wan Welatperwer û Dilsozên hanê, destikê girêdana di navbera xebatên cuda de û navnişana yekitiyê û serxwebûna welatê bi gorî ve dihate biderkevtin.

Lêbelê gava Xwediyê rojnama bi navkirî ve û Serokê Sernivîsarê wê hate binexweşkevtin, weha Birayê wî Mîr Ab- Dul- Rehman Bedirxan li Qahire de, li Cinêfê de û di pişt re jî li Volkston de ew rojname dida biderxistin. Weha piştî dazanîna Destûra Osmanî ev rojnama hanêyî Kurdî li Istenbolê de di bin Serokitiya Mîr Sûreya Bedirxan de û di pişt re jî di pêla Cenga Cîhanîyî Tevayî de careke din hate biderkevtin.

Weha yekemîn civata siyasîyî kurdîyî mezin di bin nav û nişana "Cumyê Al-tealî wel tereqî Kurd" -Civata Bilindîyî û peşveketiyî Kurd- ve hate bipêkhatin, ya ku ew der Istenbolê de di sala 1908 de hate bipêkhatin. Weha jî Danerên wêyî Gewreyî pir nas ji Merovên Kurdên xwedan nav û nişan ji van navên tîn: Mîr Amîn A-lî Bedirxan, Sergird şerîf Paşa, Gorîyê Welêt Seyîd Ab-dul Qadir, yê ku ew jî bal Kemalîyan de li Diyarbekrê de bi sêpîyê ve hate bidarvekirin, Damad Ahmed zû El-kuful Paşa û hinên din jî têtin biditin.

Herwehaji di vê pêla hanê jî de li kêleka vê civata siyasîyî gewreyî hanê jî de civateke wêjeyî nazdar di bin nav û nişana "civata Belavkirina Zanyarîyên Kurdî" de hate bidamizirandin. Weha wê dibustaneke Kurdî li

Cenberli Taş ji bona fêkirina Zarokên malên Kurdan li Istenbolê de dikarîbû bida bivekirin.

Lêbelê wergirtina Itihadan hevsarê kar û baran di Selteneta Osmanî de û pêkanîna wan Serpereştîyeke Zordar û Diktator di bin perda Destûr û Demokrasyê de herdu civatên hanê bi hev re dane bigirtin û dibustan jî dane bihilanîn. Lêbelê civata siyasî- " Civata Te-Alî û Tereqî Kurdî" -Civata Bilindî û Pêşveketîyî Kurd- hate bineçarîkirin, ku ew bes û bi tenha ve kar û barên xwe bi rêyên veşartî û rengên dizî ve bide bikirin.

Di sala 1910 li Istenbolê de Civata "Hêvî" Kurd ji bona Xwendevanan jî Mîrzayên Omer, Qedri ji Malbata Cemil Paşa ji Nasyarên Diyarbekrê, Fuad Temo Begê Wanê û Zekî Beg ji Xwendevanên Xwendegaha Çandinîyê li Istenbolê de li ser dawxzaz û piştgirtina Xelilê Xeyalê Motkê de hate bipêkhatin.

Weha ev civata hanê bi kar û barên xwe ve ji bona bi cihanîna mebestên xwe tanî kevtina Turkî di Cenga Tevayî de pê dihate birabûn. Wêna kar û barên xwe date birawestandin; jiber tevaya Endamên wêna ji bona qadên ceng û şer hatin birêkirin. Herwehaji di vê pêla hanê jî de Mîrzayên Hemze Efendî, Memduh Selim Beg û Kemal Fewzî Beg, yên ku ew di vê dawîyê de li Diyarbekrê de hatin bilikarxistin, wan bi hev re li Istenbolê de rojnama "Jîn" ya Kurdî didan biderxistin. Herwehaji Mîr Sûreya Bedirxan li Qahire de piştî li hevhatinê de "Civata Serxwebûna Kurd" date bipêkanîn. Wehaji Mîrzayên ji Beg û Paşan, Seyid Ab-Dul Qadir Gorîyê Welêt, Xwedê lê dilovanîyê bike, Amîn A-lî, Murad Mohemed Alî, Xelîl Ramî, Kamîran ji Zar û Nevîyên Mîr Bedirxanê Mezin,



Fuad Paşa û Hikmet, Hisên, Şûkrî, Fuad Mehmud û Alî ji Baban, Seyîd Ebd Eb-Dula, Remzî Begê Xarpûtê, Akrem Begê Cemîl Paşa Zade, Necmidîn Hisên, Memduh Selîm, Hesên Hamid, Firîd, Doktor Şûkrî Mohemed, Hisên Ewnî Wênerê Xarpûtêyî berê, Mohemed Wênerê Melatyayî berê, Amîn Zekî, Serheng Xelîl Begê Dirsimî, Mehmud Nedîm Paşa, Sergird Mustefa Paşa Sulêmanî, Sergird Hemdî Paşa, Qayim Qam Mohemed Amîn Begê Sulêmanî, Şêx Alî Şêrolî, Seyid Şefîq Efendiyê Xêzanê û hinên din ji nava Navnasan Civata "Tealî Kurdistan" datin bipêkanîn.

Herwehaji di piştî vê re ji Mîr Amîn A-lî, Celadet û kamîran Bedirxan, Kemal Fewzî, Akrem Cemîl Paşa Zade, Doktor Şûkrî Mohemed, Memdûh Selîm û hinên din Civata "Rêxistinên Civakiyî Kurdistanî" datin bipêkanîn. Herwehaji pêrejî di vê Pêla hanê de bi xwe ji ve li Istenbolê ji de civateke kurdîyî din di bin navê "Partiya Netewê kurd" de dihate bidîtin.

Van civatên hanê bi kar û barên xwe ve li Istenbolê de tanî hatina Leşkerên Kemalîyan di nava wê de pê dihatin birabûn û ew di pişt re li welatên din de li derve de bi wan pê hatin birabûn. Weha bi sedan şax û çilkên wan ve li hêlên Kurdistanê de dihatin bidîtin.

Weha bi vî rengî ve tevaya van civatên hanêyî cuda piştî pêkhatina civata "Xweyîbûn" ya kurdîyî welatperwer di vê dawîyê de wan xwe ji hev dane bixistin û tevaya Endamên wan ji bona vê civatê hatin bikevtin, ya ku ew bes û bi tenha ve bi civata yekaneyî jêhatî ve tete bidîtin. Weha bi vî tonî ve tevaya hêzên siyasîyî Kurdî xwe li dora ala vê civata hanê de dane bicivandin.

## Kurd Piştî Destûra Osmanî

Di tîrmeha de sala 1908 Destûra Osmanî hate bidazanîn. Weha Itihadiyan, yê ku ew bi navê Pehlewanên Wergerandina Osmanî ve hatin binavkirin, hevsarên kar û barên Seltena Osmanî di nava destên xwe de datin bidanîn. Weha wan ji tevaya dunyayê re him li hundûr û him jî li derve de datin bibelavkirin, bê ka ew çi ji Pirojeyên siyasî, Avanîyê, Civakî, Rastkirinên Serpereştîyê û ji yê din ji peyv û sozên xweşkok dixwazin bidin bicihanîn. Weha bi vî rengî ve wan siyaseta giştî çî li hundûr û çî li derve jî de pê dane bisergêjkin.

Wehajî Ewropa bi van sozên vala jî ve hate bipêbawerkirin, jiber vê jî wê bicihanîna biryarîyên girtîyî Kongirê REVAL dijî Selteneta Osmanî date birawestandin. Jiber rojnaman li hundûrû dest bi belavkirina gotarên zengilî ve di Biratîya Osmanî de, di Wekhevîbûnê de di navbera Musulman û Nemusulmanan de, di navbera Turkan û Miletên din de ji Miletên Osmanî di mafeyên bajartî û civakîyê de bê cudabûna di navbera oldariyan û Milîbûnan de datin bikin. Vê ragiyandina

hanê di nava Xelkên Kîndar de li ser Peyên Selteneta Osmanî de xwe date bikêrkin. Weha wêna di navbera wan de kîn û nakokî date bihilanîn. Weha Xelkê çavdêriya pêkhatina Dewleteke bajartiyî demokrasî bi rast û durûstî ve ji Nevîyên Mengolan didan bikin.

Wehaji bi vî rengê hanê jî ve Xelkê bi zayîna Fereştiya azadiyê û demokrasîya rast ve ji Bêjiyên Hovên Mengolî pê didan bibawerikirin, yê ku bedbûna wan di kevnar de hatiye binasîn.

Lêbelê jî tevlivê jî wan Nevîyên Mengol û Teteran jî, yê ku wan xwe di pişt perda bajartîya tenik jî de didan biveşartin, her û her bi şev û roj jî ve hêjî didan bikarkirin, da ku ew pîlanên dujehî û rêyên şeytanîyî xwînavî ji bona nabûdkirina Xelkên Neosmanî û qirkirina wan bi wergirtina (asîmilasyon) wan ve, bi sorgonkirina wan ve û bi kuştina wan ve bidin bicihanîn. Tevlivê jî wan hêjî didan bidazanîn, ku ew bi Siyaseteke "Welatperwerîyî" nuh ve didin bigirtin. Bi serdejî ve wan ango Gencên Turkan xwe nala Şagirtên Nuhvanên Ewropî didan biderxistin, yê ku ew Siyaseta Turkiyî Toranî, ya ku tanî wê çaxê jî Selteneta Osmanî û nemaze di pêla Sultan Abdul-Hemîd de li ser diçû, bi Siyaseta Osmanîyî musulmantî ve dixwazin bidin biveguhertin. Belê cudabûneke mezin di navbera cewher û koka herdu Siyasetan jî de ne dihate bidîtin. Jiber vê Selteneta Turkiyî Osmanî ji roja pêkhatina xwe tanî dawîya pêla Sultan Abdul-Hemîd jî her û her ji bona Wergirtin û Tevlihevkirina Xelkên Neturkî, Musulman yanî Nemusulman jî di nava Turkan dida bikarkirin û ew ji bona mebestên xweyî Milî û bicihanîna dilbijandinên xweyî Sipahîyî Mengolî didan bikaranîn.

